
helbest

MEHWÎ



# DÎWAN

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

# Dîwanî Mehwî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Dîwanî Mehwî

**MEHWÎ**
**(MELE MIHEMEDÊ MELE OSMANÊ BELXÎ)**
**(1830–1906)**

NEFEL
Stockholm
2007

www.nefel.com
info@nefel.com

**Mehwî:** Dîwanî Mehwî

Weþanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Nefel

Çapa dîjîtal: 2007
ISBN: 91-89687-22-1

Edîtor: Arif Zêrevan
Serastkirina latîniya kitêbê: Newzad Hirorî
Grafîka pirtûkê: Nefel

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok


Pîtî A ........ 7
Pîtî B ........ 17
Pîtî C ........ 21
Pîtî Ç ........ 22
Pîtî D ........ 24
Pîtî E ........ 26
Pîtî Ê ........ 36
Pîtî F ........ 41
Pîtî G ........ 42
Pîtî Î ........ 45
Pîtî J ........ 50
Pîtî K ........ 53
Pîtî L ........ 57
Pîtî M ........ 60
Pîtî N ........ 69
Pîtî O ........ 74
Pîtî Q ........ 75
Pîtî R ........ 77
Pîtî S ........ 81
Pîtî Ş ........ 84
Pîtî T ........ 86
Pîtî Û ........ 97
Pîtî W ........ 99
Pîtî X ........ 101
Pîtî Y ........ 103
Pîtî Z ........ 104
Pîtî »hemze« ........ 107
Pîtî »‘eyn« ........ 108

Çiwar xiştekiyekan ........ 110
Takekan ........ 118

Beşî ayînî ........ 120
Stayişî Xuda ........ 132
Parranewe le Xuda ........ 134
Qesîdeyî behrî nûr ........ 135
Stayişî hezretî Mewlana Xalidî Neqişbendî ........ 146


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Pîtî A

**–1–**

Lem behrî fitne bellkî necatit bida Xuda
Dawênî “ya Xuda” bigire, berde ”naxuda”

Bêkes min im, kesê le zubanim biga niye
Hemdem xudanenas in û dem pirr le ”ya Xuda”

‘Ehd û wefa ye suxreyî bed’ehdî û cefa
Her ma be dadî ehlî wefa da biga Xuda

Her ew kese ke xeyrî du‘ay xêrî dîwe lêm
Daîm du‘am e şerrî le min la bida Xuda

Lutfê be hallî min ke, witim; ew witî be qar:
To şêx î ba Xuda û emin şoxî naxuda

Xeyrî eme ke swêndî diroy pê bixon û bes
Qurbanî nawî, nawî le nawa nema Xuda

Ta zullmetî wicod e terîkî le torî ‘îşq.
Sêber nema, hetaw e, ke Mehwî nema, Xuda

**–2–**

Bo gumbiwanî çollî mehebbetyetî, Xuda
Tebşîrî wesselamu ‘ela tabi‘îl huda

Mustexnî ye le mennî sefîne û sefînewan
Her kes ke îşî her be Xuda bê, ne naxuda

Dill boye xoşiy dê le nexoşî be pirr bedill
Bîmare çawî yar û xoşî dê le derd û da

Be Xuda qesem le gell dillî xallê le sozî ‘îşq
Tekrarî herf e, bes demî pirr ya Xuda Xuda

Guncayişî celalî xeyallî ewim le dill
Cê bo newey sema ye le yek dane kunc û da

Lew rojewe cuda biwe lêm ew perê weşe,
Rojim reş e, şu‘er û dillim lê biwe cuda

Bes karî dilltiwênewe Mehwî le pêşte
La yehsebu îlla nasîn en yutreku suda

**- 3 -**

Becê nayê, debê ro keyne sara,
Heqî adabî mecnonê le şara

Ke çerx Eskenderî dê derdedar e
Witê: Em hem biwe hem derdî Dara

Heta heq nasîr e, her heqim e menzûr
Weku Mensûr eger bimken be dara

Negeyme ew ciwane û geyme pîrê
Meded ya pîrî pîranî Buxara

Le ber zar û nezarê bome wek poş
De emca rabiwêre min be zara

Meger to ‘erzî hallim key le kin yar
Qellem, saxî qise, min nîme yara

Le rim dê zahîd em zistane, zanîm
Kilk nada bezirrpingî behara



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Were destê bexonim ke nîgarîn
Xuwênî min hellallit bê, nîgara!

Zû ew şoxe le ‘aşiq werdeçerxê
Le gell kes çerxe ew naka mo dara

Mujey xwênê deka her lehze, seyr e
Emende gull le bin yek to kexara

Ke şik bem Mehwiya her şerbetî merg
Le ser erza niye awî gewara

**- 4 -**

Yar ez wefa guzeşt berayin kuşteî cefa
Şud meşhudem ez meqdemi ew rewzeî sefa

Çun der fiqaş dil şudeganiş nemîftened
Kakil kemend can ve dil afgende ber qefa

Kurdê zubanî esllim e ger terkî kem be kul
Bo farisê, be kullî emin debime bêwefa

Dorî mebîne to le kerîmî beha neco
Herçê ke kurd e pakî bibexşê be bu l-wefa

‘Efum ke ya ‘Efiwwu be heq cahî ew şehe
Ayey ‘illuwwî cahî ew e ayetî ‘efa

Mehmûdî fî ssema ye, hebîbî Xuda ye ew
Meqbûlî baregah, ew e muxtar û mustefa

Sellî ‘eleyhî îlahuna ma yelîqu bihî
Me‘e sehbîhî we alihî we l-ehlî dî ssefa

Teşwîşe hale min tu ez texlîte min bifehim
Ez ahle zimane bes ke resd ber dilim cefa

Gufta bitim: Wefa teleb ez min tu Mehwiya
Der ‘umre xud şunîdeî ez ‘umre agir wefa

**- 5 -**

Erê dill bê şerabî le‘lî gull rengit le gull çi bika
Ke cîlwey gull le gullşen da nebê, bulbul le çill çi bika

Ke hellgîrsa le norî bade şem‘î husnî canane
Neçête ser terîqey hezretî perwane, dill çi bika

Be ahim ger reqîbanit bisotên, ey gullî re‘na
Merrence, to Xuda şu‘le le aqarî çiqill çi bika

Heta mawe debê eşkî nedamet dawerênê çaw
‘Ereqrîtin nebê, şexsî le karî xo xecill çi bika

Sefer caîz niye, ba bo herem bê, lew ber û bome
Feqet meczûbî zincîrî nesîbî aw û gill çi bika

Felek her ga kesêkî hellbirrê, weqtî hîlaketî ye
Ke ser bo geyne pet bê, pê le kursê û eskemil çi bika

Le ‘uşşaq û reqîb ew şoxe çawî lutfî wergêrra
Ke ask ademê ya seg bibînê, xeyrî sill çi bika

Çi hacet nergişî mestit bikem wesfî be mexmûrî
Ke çawê surmekêşrawî Xudayê bê, le kil çi bika

Le her cêyek hellê xurşîdî ‘îşqî gullruxan Mehwî
Eger ‘eqllî bibê, lew cêge awingî ‘eqill çi bika

**- 6 -**

Têgeyû şîweniyî ye emrro, da sibey şayê bika
Pêgeyû derwêş e, da subhey şehenşayê bika

Nûrî ‘umrî serif eka bo keşfî tarîkê le xellq
Wek çira her kes be şoxê meclîs arayê bika

Ner le dinya çakeyê sadir bo tefrey pê nexoy
Rospê her rorreş e ger bê sed azayê bika

Bo dukanî muşterê ger hewil eda kallafiroş
Dînî wa dênête qîmet xwace e‘zayê bika

Rem deka hetta le mîhr û meh cinûn adabî ‘îşq
Sêberî lê bar e her kes meylî tenhayê bika

Maderî gêtê le şîrî birriyewe, debirrêtewe
Faîdeyî çî şexsî lêkewto ba  dadayê bika!

Ba heqîşî bê, le bo Mensûr ena l-heqqu heq niye
Şêtî ye Mecnûn eger bênazî Leylayê bika

Zuşt û naşêrîn e pîr, emma çi şîrîn e eger
Çawî xûnbarî nedamet rîşî xurmayê bika

Dill le îdrakî heqîqet bê beş e bê daxî ‘îşq
Mehwiya dana debê bem çawe bînayê bika

**- 7 -**

Mijdêkî çende xoş e reqîbî milî şka
‘Eybî feqet ewende ye yarim dillî şka

Day îznî herçî dîde xezale legerdî rêyî
Bêçare kilfiroşe rewacî kilî şka

To çûye bax û, piştî şka, heqî ye, baxewan
Bazarrî gull şkawe, dillî bulbulî şka

Xendey leb û ebîrî xetî to bu wek minall
Towî tika ke xunçe, wenewşe milî şka

Rûtê le seyrî poşteyek bo çi xoşî wit:
Seyrî heye feres ke peroşiyî cilî şka

Xunçe demî le basî demî to we da, seba
Miştêkî da le demî, dem qisey zilî şka

Ye‘qûb-weş ke Mehwî ye, çawêşedarî hîcir
Çawî be gerdî rahî be şîrit gilî şka

**- 8 -**

Gerdî rêyî hestawe cê dawa deka
Bexte! Mallî çawî kê awa deka!

Werdegêrrê ro ke sucdeyî ber debem
Hey dellê: Key niwêjî rojawa deka

Çawe, cêyî ew şoxe bê, witim û, witê:
Em mela şêx e qiseyî bêca deka

Kuşteyî ew çawem le cem‘î kuştegan
Xencerî mujgatî min munha deka

Da be yekbare be ba da ‘umrî xellq,
Dê be ba kakollekey ta ta deka

Çawekey beydestî mestîş e, keçê
Her be lehzê fitneyê berpa deka

Ew ke dill duqed deka şîrî biroyî,
Î ke xencer bo beqed xoya deka!

Zamî dill wêran û mallawa tebîb
Mallî wêranim ke mall awa deka

Turkî çawî mestî, Mehwî mijde bê
Wa kebayî cerg û dill dawa deka

**- 9 -**

Wek bulbul ew dille be gullî ro ke ro deka,
Perwane ye ziyaretî şemi‘ arezû deka


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min wesllî ew beraberî cennet degirim û ew
Dozex be ahî sîneyî min ro be ro deka

Rîşêkî pan û tokî binagiwê dirêj û lûl
Sofê le dînî la de be dîmen lecû deka

Ger ‘aşiqî le xoyî ciger qum de, dem mede
Meyxwar e, xamkar e heta hawûho deka

Dinya be hîle meylî be ebnayî eger bibê
Em daye rêzbare be firzendeyî şû deka

Eşkewtî ba ye ke demî wa‘iz ke dête we‘iz
Weqtî sikûtî neqşî simêllî lequ deka

Da ’eksî cîlwe dernekewê, nek le çakî ye
Ew şoxe çakî sîneyî Mehwî rifû deka

**- 10 -**

Dewrî her çawêkî emrro dawe sed fewcî bella
Dîn û dill yexma deken, çarî ken ey şêx û mela

Wesyetî Mecnûn e: Her kes derdî dinya ‘ar e boyî
Xo bika wek min be derdî ‘îşqî yarê mubtela

Kotirî dill, çengulî bazî qeza ye‘nî mujeyî
Dî, be zullfî çû pena ba, kewte nêw dawî bella

Weqtî niwêjî ser cenazeyî bo şehîdî ‘îşiqdost
Mewc eda em asmanane le dengî es-sela

Ta nebûrî to le ser, rê naxeye meydanî ‘îşq
Ser le pêşî pê debê lem rêge danêyî ewwela

Turkî min kuştarxaneyî ‘aşiqanî dî, witî:
Min birincî bir Yezîd êre aykincî Kerbela

Mehwî emşew ew perîşêweyî le xew dîbê debê
Boye emrro Mewlewî kewtote hallî helwela

**- 11 -**

Dem û zarê tiya mabêtewe rengarî rîq emma,
Piyallêkî 'eqîq e, pirr le badêkî 'eqîq emma

Le pirr ew çawe helldebirrêt û cergî 'alemê debirrê
Niye, her berq e xemzeyî dill şkafî, bê berîq emma

Le fîrqeyî xaksaranî mehebbet bifikire yek yek
Dîmen yek nefer, damen be lêwî sed ferîq emma

Be pêçî xwarûxêç îma deka pîrî terîqet: Bê
Heqîqet pîrezahîd pîr e, gumkirdû terîq emma

Çerakirdin le baxî husniya, menzûrî ye çawim
Ke degirê rîşî.... le behiraye xerîq emma

Demê bû yar û hemdem bû le gell dill sebir û hoş axir
Le ber bê tabî, ew teşrîfî bird û bê refîq em ma

Billawey kird û royî komelleyî yaran û ehlî dill
Le şûmiyî bexte Mehwî mawe bê yar û refîq emma

**- 12 -**

Bûme xakî serî rêyî, pêyekî ta pêma na
Witî: Sed def'e bixo ey herîkeyî bêmana

Tellebî rehm û mirwet le dillî ehlî zeman
Tellebî awî heyat e le serabistana

Qatî piyaw e le ser em erze. Debînî Mensûr
Be serî darewe. Zennûn e le bin zîndana

Le qisêkî lebî pişkûtuwe şorî du cîhan
Qiseyek sed lekî mana le likî damana


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qesemî giwêmî be çawî beçeda pîrî muxan
Ke le mewla nebî bê we‘iz û qiseyî mewlana

Toyî serxistuwe binxak e, serefrazî ber
Her le rêgeyî telleba bû serî dana, dana

Witim: Ew xalle çi bû her kerretêkit derxist
Witî: Daxê bû be cerg û dillî Mehwî ma na

**- 13 -**

Ke dill detiwêtewe bo to, dekey ew roje to birrwa
Ke xo derxeyî weku xor dill weku şewnim le xo birrwa

Ke rohim tê geyî to hez be derçûnî dekey, derçû
Debê ‘aşiq ke dî bêzar e yarî, bê birro birrwa

Witim ba lem der û lem koye da anê sikûnet kem
Witî: ‘Aşiq debê her derbeder bê, ko be ko birrwa

Reqîb derk e, em berder ke pak e pîs eka, fermûyî:
Ke bem berqapiye lazim segêkî wa ye, bo birrwa!

Witî Mehwî min û to aftab û sayetîmsal în
Cenabî min ke derkewtim, debê teşrîfî to birrwa

**- 14 -**

Key le kin ehmeq debê hacetî dana rewa!
Qet dekirê çermeker ya be ‘eba ya kewa!

Bexşişî dinya mexo, ye‘nî be nanêkî co
Xo mekere ber minet pîrejinî nanewa

Êste ke destit dega pê bisuwe bo necat
Heyf e le dinya birroyî kamî dillit narrewa

Girî ye decoşê lewê, ah e debê nesrewê
Nemdî wek îqlîmî ‘îşiq cêge be ab û hewa

Dîntim îman e xo, kufre negeyînim be to
Qurr be serim, dîn e, çû; kafirî ye, bû ewa

Agirî daxî dillim penbe ye, saxit dewê
Nîme weku çawî yar taqetî nazî dewa

Kê ye dellê bênewa kes niye Mehwî nebê,
Bêt û le her bin miwê da bibyê sed newa

**- 15 -**

Ey cemalit tûrî dîdeyî enbiya
Şamî turret subhî ‘îdî ewliya

Ew ber û bûm e cenabî to tiyayî,
Berdî bo medurre, gerdî tûtiya

Awî Xizir e xakî ew berqapiye
Dirrkî ew berderke gull, pûşî giya

Aftabî girtewe, wek kase, çerx
Siwallî lew ruxsare bû derrê ziya

Ehlî rehim û fezillî to Mehwî dexîl
Sed ke wa naehl e, rehmit bê piya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî B

**- 1 -**

Bo şewî hîcir ew meh e wek aftab
Cîsmî wek rohî, gillî kirde hîcab

Bew cemale ’îşq û, bew cahe hesed
Hem dillî min, hem dillî duşmin kebab

Ba wicûdî lêwî şekkerbarî to
Bê û cûde neş’ebexşînî şerab

Beytî zatî to le dîwanî wicûd
Morî heq kirde be noqteyî întîxab

Bêhîsab e ger gunah, bakim çi ye!
Hezretî ew şafî‘ e rojî hîsab

Ber şefa‘eyî ew şefî‘em xeyî Xuda
Xoşim û ehbab û ehil û dak û bab

**- 2 -**

Mahî min rojê le rû la da nîqab
Şew meger hellbê le şerman aftab

Lêwî her hate qise, rohim çuwe
Bo sualî ew, bellê roh e cewab

Ezyetim kemtir deda, da rojî heşir
Zorî ranegirin le gell min bo hîsab

Rame hetta bo segêkî wek reqîb
Ew cenabe her le miniye îctînab

**- 3 -**

Zilley mu‘ellîm, ew gullî rûmetî ye xiste teb
Tebbet yeda Ebî Lehebî bêedeb we teb

Azarî dam û her kese kirdî le girdî xoyî
Hêzim keşî cehennem e hemmalete l-heteb

Zahîd, Xuda le nawî berê, nawî ‘aişqan
Boçê deba ewende, Xudaya, be bêedeb!

Dill her be daxî ‘îşq e eger îmtiyazî bê
Wek noqteyî întîxab e le ser şîirî muntexeb

Wa‘iz le min billê be nezer te‘ne bes bida
Dînî bitan e dînî min, ew mezhebî zeheb

Her roje mirdinêkî ye bijyê be rohî wa
Destî ke wê begirtineweyî destî bo teleb

Babî witî be hame: Xezeb. Ew billêse ye
Berbote rohî babit û ber ‘umrî bû leheb

Hem demkujêt û dîn û dillîşim deba, dellê
Min men qetel, emîş e qetîlim, liye s-seleb

Mehweiyî wit û zubanî ciwabim nebû, gerra
Lêwî le lêwim, ew deme rohim geyişte leb

**- 4 -**

Be yadî ew lebe, ey şoxî rûmet rojî mehxebxeb
Lebaleb ma le nallem sîne, herwek kotirî lebleb

Le weqtêka ke rohim geyiye ser leb, rohî min be fîdat,
Debête rohî taze, ew lebem ger bêniye ser leb

Be cê ye. Çunke ew hesta. Qiyamet cê be cê hesta
Le çerx emşew, weku eşkim le dîde, dawerî kewkeb

Eger wa'îz dused te'ne bida, te'nêkî lê nadem
Egerçî musteheqqî le'n e, ba bo rafizê bê seb

Hezer lem heşrî bêwadeyî le qebir hellsandinî mirdû
Be ser qebrî şehîdana be şoxê ling edey merkeb

Şewî rîhlet pider – rohî murewweh – wesiyetî fermo:
Mehebbet mezhebit bê, nûrî çawim, meykeşî meşreb

Du espe menzillit pê tey deken ta serhedî mirdin
Be dîqqet Mehwiya tê fikire, şew şebdêz e, roj eşheb

**- 5 -**

Ke to xayib le ber çawim debî, çim bê le to xayib
Qiyamet hazirî ber çawim e, xomim le xo xayib

Xîtabit her 'îtab e, ew lebe bête qise, her kes
Muxatebit e, deka derdem zubanî giftûgo xayib

Le xwên û xake da Koken witî meqsûdî Xusrew bû
Bibînin macera, teblîxî ken şahîd le bo xayib

Şukir to le fikirim naçî, egerçî min le fikirt çûm
Le min xayib nebî to, besim e, ba min bim le to xayib

Dezanê roj e ew, min şew, ke çî pêşim dellê: Mehwî
Hizûrî ger hemî xwahî, meşû Hafîz ez ev xayib

Depirsê: Boçî min derkewtim û dill bû le to xayib?
Ke wextê roj hellat, ellbet debê şewnim le xo xayib

Çi yara ye, be bê îmayî ebro seyrî ew çawe
Herame meykeşî lem meykede bê ruxsetî hacîb

Depirsin: Kîmiya? Xidmet be merd, emma be îxlasî
Weger na, kem le Bûbekirî nebû xidmet Ebû Talîb

Be naw êmeş rîcal în û rîcalî hum rîcalun hem
Be fecrî naw deben, sed heyf, eger sadîq eger kazîb

Le ʿarîf ʿamiyek pirsî hewallî meslex û qessab
Be enguştî şehadeyî kird îşareyî mehkeme û naîb

Le heqbêjî buwe behrî ena l-heq her qesîdêkim
Le batî caîze, wacib gerra qetllim biken wacîb

Dill e ʿerşî Xuda Mehwî. Xecallet be le ber xeflet
Ke bote butkedeyî bêberrhemen ya deyirî bêrahîb


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Pîtî C

**- 1 -**

Bo pare heyf e xo dekeye pûlî narewac
Bo parwêkî nan esef e rû dekeyî be sac

Rêyî da le qapiya bimirim. Pêşî ser serim
Na, wa geda debê be xudawendî text û tac

Bo zebtî mullkî dill bes e lew lêwe yek qise
Şah im, be sewqî leşkirî xemze çi îhtiyac

Ba bêne seyrî gerdin û sîneyî nîgarî min
Neydîwe her kesê bitî zîw senem le ‘ac

Key dill desênrê lebtê sendbêtî ew
Lêwî le Mîsir u zullfî le Çînê xerac û bac

Kê qedrî şî‘rî ême dezanê, berî deka
Her sahêb e le ber kerî kallayî bêrewac

Mehwî ‘ebes be dîdeyî bîmar maîl e
Nagîrê aşnayê le gell mestî namîzac

## Pîtî Ç

**- 1 -**

To nebînin, nûrî em çawane boç!
Bo nîsarî to nebê, em cane boç!

Cîlweyî ew husne niye ger kar ger
Bo cemadîş, ayin e heyran e boç!

Dill le sînem hîcretî kird û witî:
Bone, ‘umrê, ferşî ateşxane boç!

Çollî dî sînem le dill, bo sûtinî
Emirî da, şêrî nebê em lane boç!

Xwênî cerg û kuncî ‘uzlet besim e beş
Berminetbûnî mey û meyxane boç!

Saîlî ew berdewam, witim û, witî:
To geda yî, em nexwetî şahane boç!

Her be tîrî xemze kuştin, nek be şîr
Heyf e, xon alûde ew damane, boç!

Zahîd ew zullfeyî le ser rû dî, witî:
Kufrî wa rûpoşî em îmane boç!

Her be hesret, nek be zerbet, kuştimî
Da nellên em qetllî bêtawane boç!

Taqe xanêk e le ser rêyî axîret
Zadî rê hellnagirê lem xane boç


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mehwiya bazêkî to, Qudis aşyan
Bû nebûmî şûmî em wêrane boç!

**- 2 -**

Em ‘esre, ‘esr û weqt e le bo facîrê le hîç
Dînî neka wîqaye, heya neygirê le hîç

Dinya be kamî hîç kesane hemîşe dem
Hîç ellbete be hîç demê nabirrê le hîç

Dinya ke hîç e, cumle dezanin, ke çê çi kes
Merdane bo Xuda niye des hellgirê le hîç

Ta ser nebote go, de le dinya de to şeqê
Her em şeqe be kar e ke wa helldirê le hîç

Maçî demî le kellkellema bo, çi xoşî wit:
Qirim: Ey esîrî wahîme, xoş nakirê le hîç

Dem nadiyar û nazî qiseyî pirr be deşt û şar
Dinyayek awî zîndegî û derxirê le hîç

Mecnûn e şahî ‘îşq û biyabanî barega
Ahî deka hemîşe be pa çadirê le hîç

Dîqqet ke, xeyrî ruşteyî can û miyanî yar
Ruştem nedîwe, Mehwî emin, badirê le hîç

Çawî kewê ke bem xezelem durrşinasî şî‘r
Kê bê dellê emende guher wergirê le hîç

# Pîtî D

**- 1 -**

Dillî sûta be hallî zarî tîflî dillim û çarî kird
Serî zullfî le dem na, zehirîmarî pirr be zarî kird

Be ser ruxsarî zerd da cogeleyî kêşawe eşkî sûr
Be yadî seruyî ballayek ewendem şîn û zarê kird

Hucûmî hîndiwî xet ser ferengistanî ruxsarî
Be heşrê bû, weku ew heşre mîqado be çarî kird

Witûyane ke nan ew nane ye emrro le ser xiwane
Çuwe, çû, pê çuwe, kem‘eqill e her kes basî parî kird

Qiseyî zullfî ewende tolî kêşa taqetî çû xoyî
Witî: Şew nîwe bû, nebirrayewe, kê basî marî kird

Le bo îmdadî giryanim, derûnî kirdime xwênaw
Le çawim seyrî ken em hukme cerg û dillimî carî kird

Xetî piştî lebî dî, bûme çar ebro witî: Witman
Ke her kes bextiyar e îxtiyarî çar yarî kird

Beyanê hate bax ew mahe, em wa tê geyî roj e
Le şebnim, gull be damen gewherî hêna, nîşarî kird

Rehe bew şêtiye elheq qisêkî ‘aqillaneyî wit:
Minim ‘aqill le bergî ‘arî ye xomim ke ‘arî kird

Dillî bê bar e, mayeyî kar e, her kes karûbarî xoyî
Le dinya da, miweffeq bû be dill tefwîzî Bariyî kird


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Cinûnî new zuhûr e Mehwiya dêwanegiyî Mensûr
Ke dêwanen hemû mayîl be berd, ew meylî darî kird

**- 2 -**

Çi xeyallêk e lîqa bê be fenaçûnî cesed
Ta perîşan neşud kar bisaman nerised

Her dillê pê we nebê dax û xetî cê demî têx
De‘wiyî ‘îşqî bibê de‘wî ye bê mor û sened

Exllebeyî tekiye û dergahî bîladî Romim
Pişkinê, dê, Çelebî her cellebî bû, ded e ded

Xew ezanê niye, deywit: De binû bême xewit
Nêk bextim be wenewzê bike, ey bext e meded!

Daxî kone û şebeqî taze le sîneyî çaka
Têkell in, seyrî heye pirr le gull û lale sebed

Xeyrî wehdet le wicûd da niye, kesret wehim e
Şade tekrarî yek e, menşe’î ewhamî ‘eded

Çarî her derd û xemê kirdine mirdin, çi bika
Neytiwanîwe bika çarî xem û derdî hesed

Her kesê çawî ke bew cîlwe munewwer bûbê û
Kesî key bête nezer, dîdeyî pirr bê le remed

Mehwiya ba besî bê şîrkî teşebbus bem û bew
Bigire bes damenî tewhîdî huwe l-lahu ehed

## Pîtî E

**- 1 -**

Le çawî bed Xuda hîfzî bika ew şoxe sermeste
Serîş ebirrê, serîşî lê deda, hey hey çi serbest e!

Binazim bem separa naze, bazî xemze tê berda
Eger sîmirxî ber bê hem buwe yek murxî perr besit e

Esîrî çahî xem bê, xane ba derbeste bê Mecnûn
Le xeymeyî naz da ‘uşret deka Leyla, çi derbest e!

Be fikrêk e ke em xûnirrêje şîrî beste pişt emrro,
Le esto danî kê ye? Kê deka axo kemerbeste?!

Berelldakirdinî nefsit zererxêz e û fesadengêz
Be rehmet bin qedîmî ême fermûyane: xerbest e

Qisêkî pirr le te’sîrî be firzendî dewit pîrê:
Ezîzim taze geyîwî to, emin barî sefer beste

Le ber qapî xerabata minî dî, ‘îşweyêkî kird
Witî: Mehwî le badet çî, eto xwênî ciger beste

**- 2 -**

Ke dîm aloz e çawî, zû witim: Em fitne hellbeste
Witî: Caran eto detwit be min: Kem fitne hellbest e

Be sûtin çim, gilem nebuwe le derdî serdî mîhrî to
Min û şekwe? Witî: Giwê nagirim lem fitne hellbeste

Be xeyrez şukir, eger şekwem le cewrî to bibê, siplle m
Witî: Haşa, dezanim em reqîbem fitne hellbeste


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Be cê ye kuştinim, sûtandinim, xakit be ba bo dam?!
Witî: Ahengî ‘îşqî min meqamat e le gell beste

Be zullfî da hellawesrabû dill ‘umrî be sed amal
Nîgahî wek ecel hat û witî tolî emel besit e

Qeza bê destellatit ka, çi ye xeyrî reza çare?
Le ber destî celana rêwiyêk e şêrî pelbeste

Be xokuştin necatî xo bide Mehwî weku Ferhad
Le zorî qehremanî ‘îşq, efendim, her ecel besit e

**- 3 -**

Le rêgeyî mehlekeyî ‘îşq ew bellaconî, bira, la de
Ewî min çûm û lewma dî her ah û dad û feryad e

Le behrî nûrî husnî bê nîşan îfşa ke yek mewce
Nîşanî de be ‘alem îxtîra‘î heşrî bêwade

Çi ye? Xusran, emende mestî lehû û le‘bî dinya bûn
Bira! ‘Umrî gîramî bes le rêyî em bade ber ba de

Be xîbte bew Xuda pê dawe toba lehu ye ehlî xuld
Le kûreyî narî xem da ye be daxî derdî to şad e

Hemîşe dîde behrî gewher e û dill pirr le neqdî dax
Le bin nayê be mesref çunke xezneyî min Xuda dad e

Le ser to bûme pendî ‘alemê, witim. Û witî: Mehwî
Besî bê muşrîkî. Bes, ya le dinya ya le min la de

**- 4 -**

‘Ecîbim dê le ‘eqillî ew kese wa tê dega merd e
Ke çî wek xan û xanim daîma dillxoş û bêderd e

Be pîrî mergewe firsex be firsex royîn merdan
Ewî bakî le mirdin bê diyar e billih û namerd e

Le ber qapî mehebbet ew Xuda pê daweye rûsûr
Hezîn e, dîde pirresrîn e, dill xwênîn e, rû zerd e

Le ehbabî qedîmî bezmî ulfet mawetin du ten
Yekê perwane hem derd e, yekê bulbul ke hem ferd e

Birale! Em hemû oballe bê bew gerdine heyf e
Binîşê bem hede em gerde lew mînayî bêgerd e

Le dewrim da hesar: Afet, le ser ser xeyme: Dûdî ah
Le sayeyî ‘îşqewe bûme şehî sahîb seraperde

Çi lon ew dête çawî min ke yekser ‘unsurî aw e
Mehall e min kebiçime dilliyewe, dill kîşwerî berde

Tep û tozî xubarî dîm û rêgeyî gorrî û deywit:
Detirsim damenim axir bibê alûde bem gerde

Debînim ehlî dill ya sengesar e, ya le ser dar e
Diyarî ‘îşq, eger saxit dewê, her dar e her berd e

Le baxî sêw û bey da basî ruxsar û çeneyî key bû
Xecill ma sêw û bey tirsa ke wa ew sûr e em zerd e

Egerçî min geda m, ew şa, le ‘urfî ‘îşq da Mehwî
Bes e nîsbet le beyna, min siya next, ew siya çerde

**- 5 -**

Dîde ‘eynî carî ye, dill pirr le narî muweqqed e
Ab û tabî husn edem bew gull‘uzarî mûqede

Seyrî seg mergî reqîb ke ke xeyrî ew seg e
Şîrî xemzet şêr û bewrî rû be rû bê, duqed e

Lale dax e, xunçe derd e, pê le xaka mawe seru
Ta muşerref bû çemen bew rûmet û lêw û qede

Çawî meygûnit weha meyxaneyî awa kirdewe
Çollî kird axir be zahîd xellwexaneyî şe‘bede

Dill deba xemzet, çi ferqî rend û sofî bo niye
Seydî mirdû heyfe em şehbazetî tê bermede

Beşim e pêyî qanî‘ im û besim e dax û derdî sermedî
Ser be derd în ême, bê derdî! Le ême ser mede

Şew be qetllim we‘dî da. Emrro peşîman e, Xuda!
Xo le Mehwî cunh e her gerden keçî bû serzede

**- 6 -**

Heqqen le reqîb ew ber û dergane heram e
Lew dêwe, ke em textî Suleymane heram e

Qîlêkî zeîf: Ahî hezîn îzn e le ‘îşqa
Giryanî bekull, nalleyî mestane heram e

Sûtanî be bêdengî ye adabî mehebbet
Wek bulbul em efxane be perwane heram e

Wa derbeder e dill, wetenî sînemî win kird
Lew şêre xwêrrî buwe em lane herame

Deywit ke be rehmen mehî rûyî em senemem dî
Ger bit eme bê, xizmetî bitxane heram e

Min padşehî ‘îşq im û her daxî cinûn im
Tacî ser e, baqî ke le dêwane heram e

Her koken û mecnûn e kurrî kêw û biyaban
Xeyrî kun û qujbin ke le ferzane heram e

Bê daxî nedamet dill û bê derdî esef can
Lem kalî bed e dill, le dill ew cane heram e

Xwênawî ciger, goşeyî beytu l-huznî bû
Mehwî! Bes e, meylî mey û meyxane heram e

**- 7 -**

Be efsûn û du'a tesxîrî ew şoxe çi îmkan e!
Xeyallî xaw e 'enqa nakewête dawî efsane

Hucûmî 'aşiqanî dî ke miştê ciwênî pê bexşîn
Be ser xotanya dabeş biken, sa beş bika ya ne!

Xullamane serim dana le ber pêya, weku zullfî
Keçî ew her minî xistote pişt giwê wek xullamane

Sekîneyî mertebeyî sûtanî ye ateşperistî 'îşq
Eger sahêb îradet bê 'eceb pîrêke perwane

Be bê to seyrî gullşen kirdinim her wehşetî berda
Gullim dî cameçak û bulbulim dî xerqî efxane

Nesîhet bê bira! Ger rolle bû merrwane bo aba
Gewahî 'edlî em de'waye pûrî pûrî Merwan e

Meta'î sîdq û îxlasim le bazarrî riyakaran
Le sûreyî "qul huwe l-lahu" dekem lem muşrîkistane

Ewendem lew qed û ballaye aşûb û bella dîwe
Le seyrî seruyî baxim xayleyî xûlî biyaban e

Nema cêyî ew cigergoşe, meger roh û ewîş derrwa
Cigersozane dill biriyane, dîde pirr le giryan e

Çi berqî cîlweyek hewrî beharî kirduwe bêtab
Be nalle û giriyewe dêt û deçê wek tazedêwane

Siyabextî le mecnûnî min îtir çî dewê Mehwî
Serim şêwawe, rojim tîre ye, hallim perrêşan e!

**- 8 -**

Şimşad e eme, ya qed e, ya seruyî rewan e
Ya ‘er‘er e ya nexlî miradî dill û can e!

Daxo eme egrîce ye pexşawe be ser da
Ya sunbul e kirdûye seba zullfî be şane!

Ahoyî xuten e cîlwe dekatin le xeta da
Ya çawî reşî fîtnegerî surmekeşan e!

Dill hayim e daîm ke eme qetre ye daxo
Ya cuz’êkî bêcuz’e musemma be dehane!

Em mey sîfetî xûnxore wa nazik û sûr e
Yaqûtî leb e, ya gull e, ya qûtî rewan e!

Nallandim û fermûyî ke em awaze hezîne
Ya Mehwî ye, bulbulekeyî fesllî xezan e

**- 9 -**

Le rojî helldar em konime xeymeyî tan û poşîn e
Le sayeyî da şerabî bezmî ‘uşret giriyecoşîn e

Debînî cêyek emrro bezmî ‘eyş û badenoşîn e
Sibeynê zû zemane wez‘î gorrîwe, le noşîn e

Le kê pirsim dillî bo pirr le xwênî hesret e yaqût?
‘Ezapoşî çi ye û kê ye, cilî pîroz e bo şîn e!

Beharêkî ke daxo bê, neyê, hey bên û şînê keyn
Felek her şîn e, sehra şîn e, kêw û lêwî coşîn e

Witim: Bo rût û pût in û ew kesaneyî ‘aşiqî rût in?
Witî: Şan û şkohî zînde dill her jendepoşîn e

Sefayî safî ciwanî royî û durdî pîrî hat
Xumarê mawe bes emşew le badeyî bezmî doşîn e

Kurrî bê, ta ser em dayeyî zemane memkî kes nada
Ke se‘b e şîrî şefqet Mehwiya lem şêredoşîne

**- 10 -**

Le seyrî xestexaneyî ‘îşq ewî sewzeyî ke wa şîn e
Le ser her xeste dê ya xwêndinî yasîn e, ya şîn e

Şehîdî xemze ye be‘dê, seqîmî ‘îşwe ye cem‘ê
Diyar e, serniwîştî ehlî dill ya şîn e ya sîn e

Le beng em bengiyane çî debînin, xo le xo gorran
Le dinya da medarî ‘eyş û xoşî, xonenasîn e

Be ser dill da le qapî feyzewe dê neş’e pey der pey
Çi xemzeyî dîdemexmûrêk e em şew kun deka sîne

Henasem da be nalle ‘erzî hallî kem ke tasawe
Le xwênawî dill û cergim derûnim keyl e ta sîne

Le ‘alem da ‘elameyî subhî heşir îmşew beyanî da
Xuda ‘alim, le çakî ew beroke derdexa sîne

Mela tellqînî Mehwî daneda, heblu l-metînî ew
Le cêgeyî zulle deylî re’fetî Taha û Yasîn e

**- 11 -**

Xaîb le dîde, çawî serim, dillime pêtewe!
Destim be asmanewe, çawim be rêtewe

Can sext e, ya le de‘weyî ‘îşqa dirozin e
Ew zînde mawe ta le seferyayî dêtewe!

Canane royî û can û dillim herdu dû be dûyî
Ya rebî çî bikem be nîsarî ke bêtewe!

Roşin ke çawî muntezîranit be gerdî rêt
To dêyî û nûrî dîdeyî min dê be pêtewe


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Xom û xwênimit le fikir çû, du‘a dekem
Rengî xwênî min ke le destit neçêtewe

Lehzêkî min le sewme‘e da dîbû, emrî da:
Ew herze gerde lem dere derken, neyêtewe

Însafî da ke dî tebî ‘îşqim le şîddeta
Heqî ye witî: Bem agire ger biştiwêtewe

Wek şew kişa be ser mehî ruxsariya xetî
Gîra em aftabe ke qet bernebêtewe

Mehwî be yadî towe ye şuxllî ke royî
Xaîb le dîde bû! Be Xuda dillime pêtewe

**- 12 -**

Dewayî em nefise mel‘ûnet dewê, her derd e wek cîwe
Ke hatî kuşttin, ew rohî mehz, em cewherî zîw te

Le dinya ta degate axîret karîger e tîrî
Weku tîrî tehemten zamî pak em dîw û ew dîw e

Ehwall û meqamat ew diwa xo, xo negorrê lêt
Her ew gurg e, Ebuzeydî Sirûcî tewrî gorrîwe

‘Elaweyî bû ne roh, her bîkujî, e‘da ‘edû dekujî
Çi ‘eqill e? Duşminî wa perwerî, kê xêrî lê dîwe!

Le ‘îşweyî pirr fenî dinya mebe eymen, ke wek noşî
Be tefireyî mey sed dana qerrabeyî zehrî noşîwe

Weku qetrîne behrê dîn û dinyayî pêşekî lê send
Be herkes qetre ye bermawe wesillêkî rewa dîwe

Weku dêw îşî ‘eks e, mîhrî qehir e, şerbetî zehr e
Firîb e, genimî her co, şîrî her do, ronî her pîwe

Ke destit bo le ser ser nê, ser û mallit be xaret çû
Ke lêwî pê kenî, 'alem deka serşêt û kalîwe

Le mekrî em 'ecûze û sîhrî dêwî nefs emin Mehwî
Pena degirim be zatî efdesî bêçûnî nadîwe

**- 13 -**

Ke bê lêwî le ser lêwim binê, rohim le ser lêw e
Ke lêwî la berê, ellbette rohim derdeçê pê we

Şekerbarî, nimekpaşî, eger bibuwaye min demwit:
Ke xunçeyî taze pişkûtû deşubhê bew dem û lêwe

Dellê her kes bibînê yar û exbarî be etrafa
Xuda çî n em hemû dêwe le dewrî em perîşêwe!

Heta roj e debê bo şamî şew hewillê bida her kes,
Eger şahenşeh e ew roje royî şew be bêşêwe

Beharê bû ciwanî, bû be suxreyî payizî pîrî
Be ser çû bax û baqî maweweyî miştê çill û çêw e

Meger şarî 'edem, cêyî wa tiya ser geşte bim qate
Biyabane beşî mecnûn e, xasî kohken kêw e

Emînî şêtî ye Mehwî le mekrî nefisî emmare
Meger rehmî Xuda dembestî ka em mare engêwe

**- 14 -**

Ser ke coşêkî nebê, min zirke tallim bo çi ye!
Dill ke hoşêkî nebê şîşeyî betallim bo çi ye!

Derd û daxêkî derûnî ger bibê, ba reng û rû
Sîs û muxberr bê, kemallim bû cemallim bo çi ye!

Tecrebeyî 'aşiq be sûtanî dekird ew zallime
Seyrî ken êsta dellê: Miştê zuxallim bo çi ye!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Pêyî be serima na ke bûme xakî rêyî, gerdim şukir
Geyiye dawênî, dellalliyî bayî şemallim bo çi ye!

Daxî sîne û pêç û tabî dûdî ahim xo heye
Mor û turreyî înperator û qerrallim bo çi ye!

Xelliq ewa mecbûrî dû xoxistinî xellq in be can
Min be dill menfûrime, rutbeyî cecallim bo çi ye!

Malle pîtkênêye mall û geyne hallî xo ye hall
Min ke wa hallî bim, îtir mall û hallim bo çi ye!

Pirr be pê zincîrî şêtî, daxî sewda pirr be ser
Seyrî hallî xom e, seyrî zullif û xallim bo çi ye!

Derdedar ellbet zubanî derd û hesret tê dega
Çawî bîmarî dezanê, nallenallim bo çi ye!

Dill gile û şekweyî le eşkenceyî 'ezabî zullfî yar
Kird û ew fermûyî: Ey zincîrî zallim bo çi ye!

Halle bedhallî le şiwên û mallewêranî le dû
Mehwiya! Ger ehlî hall î, hall û mallim bo çi ye!

# Pîtî Ê

**- 1 -**

Nellê merdim ke dinya piştî lew, ew rû le dinya bê
Ke pûrî zall e, boçî pîrezallî pê reza nabê!

Le derwêş û le şa em fahîşe axir deka haşa
Ger ehlî xîret î, ber lew le xoyî û ehlî hasa bê

Eger tacit le ser ka, sertî pêwe qut eda axir
Mubarek keyî debê ew xel'eteyî wa xel'î le diwa bê

Sibey xakit be ser, wek min debê tehte s-sera bê cêt
Billa emrro ke xewtî mesnedit textî sureyya bê

Le ber her daderrinrê cil, çi pînawî, çi çînawî
Debête luqme luqme paqle ya paqlawa bê

Bira, fikrî çira! Kîbrîtî firset ta le desta ye
Şewî yelda le pêşe, rojî 'umrit wext e awa bê

Bikeyn ah û fuxan û agirê berdeyne xan û man
Xerabatî mehebbet heyf e bê aşûb û xewxa bê

Le gell feryad û giriye hazir e feryadres Mehwî
Lî yebkû rê deda pîrî terîqet tîflî sawa bê

**–2–**

Le ta û e'da 'edu ber nîwe dujmin îltîca barê
Le çingî giyanellawî firqeta mawim ecel çarê

Bella her wek kule dabariye ser mezre'eyî umêd
Meger ew tîpî mujgane biken wek 'eynemel çarê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Esîrî zullif e dill, ey bazîxemze, xîretê, heyf e
Delîl, em ‘endelîbe kewtuwe ber destî qel, çarê!

Ne pêyek hellgirê şiwênî, ne destê geyiye dawênî,
Xuda! Derheq be ehwallî minî bê pa û pel, çarê!

‘Îlacî derdî ‘aşiq bote xaseyî ew dem û lêwe
Şîfayî emrazî sewda xasiyet çeşmeyî ‘esel çarê

Meger qet‘î nefes çarî bika, werna niye hergîz
Le pêwendî kemendî pirrxemî tolî emel çarê

Le gell em ‘îlme Mehwî daxdarî cehil e to tewfîq
Tebîbî bo merîzî derdî ‘îlmî bê‘emel çarê!

**–3–**

Be noşî canî werdegirim piyalleyî zehirî her nêşê
Be derdî dill biçim ger bê le cewrî to dillim bêşê

Be wem zanî le baxa çiqllî gull hellçeqiye dawênî
Ke lêre dill le sînem da birînî neşterî dîşê

Şukir yar îznî dam hem giriye kem hem qurr be ser da kem
Be carê şahî min behir û berrî bexşî be derwêşê

Lemê meydanî ‘îşq e, kilkerêwî rîşî to, zahîd
Çi bêqedr î. Debê ger şêrî bêtê kilkî rakêşê

Witim ruxset de cana, da be qurbanî lebit kem can
Witî behirêkî şehid ellbet denîşê pêyewe mêşê

Xuda girtû dillim, çotin be gij şor û şerrî ‘îşqa
Be nessî aye eflak û zemîn em bare nakêşê

Sened bê mor û xet de‘weyî mehebbetkirdin e Mehwî
Te‘eşşuq, bê dillêkî daxdar û sîneyî rêşê

**–4–**

Debê dill wîs‘etêkî wek felek ziyatir wekef bênê
Şew û rojî fîraq û wesllî dulber ta biguncênê

Dexîlit bim kurrî emrro be, ferda wa dekem hîçe
Çi ferdaha tiya nekirawe karêk û buwe diwênê

Zûbanî hallî perwane le wextî sûtina deywit:
Kesê warîsim e wek min bê, le ‘şqa xo bisûtênê

Reqîb ellbette îmşew şeq deba, canane êware
Be ‘uşşaqî teqebbul da le batî sed du‘a ciwênê

Be xeybetkirdinî em bênewaye tûşî xecllet dê
Billê wa‘iz bes em mêrûle bixwa, wazî lê bênê

Denî teb‘î weha xallib buwe, Fîr‘ewnî em ‘esre
Ne wek Mûsa, le kin cû pare bû îmanî pê dênê

Mebziwe Mehwî lem rêge da ta debiye xakî rê
Umêd e destî gerdit her dega axir be dawênê

**–5–**

Le sayeyî dewrî çerxî sufle perwer lek be lek dediwê
Segî awatexwazî êskî wiştir le şek dediwê

Debînim şêrî şêr efgen dellekkewillî deka, debiyem
Be kollê kilkewe rêwî le gell kewillî dellek dediwê

Debînê Bayezîd e, wek yezîdêkî debînin xellq
Be bê perde şeyatînî le ehwallî melek dediwê

Ne nawî roj û meh birdin, ne basî sedir û şeh kirdin
Muwehhîd her debê her yek binasê, her le yek dediwê

Muneccîm ‘umrî zayi‘ bû le behs û fîkirî eflaka
Ke pîrêjin hemîşe her le ehwallî xerrek dediwê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Be taqefexrî Kîsra, her xewerrneq fexrî Nu‘man e
Denîhîmmet weha ye her le gell kuçik û kellek dediwê

Zemaneyî sufleperwer wa rewacî sufleyî dawe
Ke daîm ew deme siwêre le gell nan û nimek dediwê

Pekî tê da reqîb ew şoxe kuştinmî ke lê pirsî
Îradeyî karî xêr ellbette şeytanî le fek dediwê

Mûmeyyîz çerxî keçrew bê, nekeyî Mehwî kemallit xerc
Zûbanî têxî ew derheq be herfî min le hek dediwê

**–6–**

Dillî birdim be şoxî dilberêkî taze ser le niwê
Mubarek bê le dill sewdayekî key kewte ser le niwê

Ke çi ebro, dîde ahu, şorrişîn xu, fîtineco, turkê
Xirroş û şor û şînî xiste naw ehlî nezer le niwê

Be naz û ‘îşwe pak erwahî pakanî musexxer kird
Be xemze xatiranî daye ber tîrî nezer le niwê

Seba kirdûye we‘deyî gerdî koyî, megirî ey dîde!
Be ummêdim cewahêr sûrime bo nûrî beser le niwê

Lebî le‘lî şîfa bexşî birînî dill deka merhem
Îşarey çawî dekulênêtewe daxî ciger le niwê

Be şêweyî şikllî şîrînî, weku kakollî muşkînî
Peşêwî kirduwe ehwallî Mehwiyî derbeder le niwê

**–7–**

Xettî dewrî lêwî allit ey mesîha lam û bê
Her le cameyî sebiz eçê bo xeyn û nûn û çîm û hê

Xunçe bazarrî nezaket darî û tengî şkand
Her ka zahîr bû le dewrî baxî husnit lam û bê

Lebşeker ta key le hesret xallî muşkînit, dillim
Daxdar û xeste bê wek lam û elîf û lam û hê

Lal e rûxsarim le sayeyî eşkî xwênîn rengewe
Çunke rûsûr im le qapî ‘eyn û şîn û qaf û tê

‘Îşqit ey cana minî rîswayî ‘alem kirduwe
Ça ke însafit bibê bo elîf û sîn û tê û hê

Êste bo laf û gezaf her kes debînî ‘aşiq e
Nek hemû kes canfîda wek mîm û hê û waw û yê

Mehwî emrro zor nexoş e qet şîfayî nayê be hîç
Ger şîfayî bêtin, be boyî zullif û ew egirîce dê


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Pîtî F

Lalxaweyî wa‘iz emrro mewc eda, dem pirr le kef
Rîşî qîrûsiya, kitêbî we‘zekeyî bû berteref

Zahîd û sofî be şerr hatin le ser tezwîr û şeyd
Xêrî rendan e Xuda ka berteref bê her teref

Werine seyrî serxoşan! Ew şoxî mînagerdine
Bû be saqî, dem be şekker xende dê, mêna be kef

Demdemeyî em heşrehestan em deme, ya reb, çi bû
Lêwî neyjen geyiye ney, defzen ke penceyî geyiye def!

Key be le‘l û gewher ew lêw û didanî da nîşan?!
Ew rehindeyî şax e, em xoşareweyî jûrî sedef

Cênîşaneyî zam e lew ruxsare, ya asarî xeg
Ya le rûyî awêne lekk e, ya le bedira bû kelef!

Men‘î nakem boye kird û koşişî damenî ye, dill,
Pêwe nîşê, hewil eda ellbette her kes bo şeref

Dill çuwe wadîyî mehebbet, herçî dî her kuşte, ya
Nîwekujraw e, le ser lêw ah û nalleyî wa esef

Lall e xo Mehwî le wesfî husnî bêçûnî nîgar
La le te’wîlî xelef, qurbanî te’wîlî selef

## Pîtî G

Witî: Boçî weha bî tîn û bêreng?
Witim: To boç ewende şoxî û şeng?

Geyiştin bew şehî ‘alîmeqame
Niye, fikirim, xeyallim xaw e, pê leng

Heta lew yarî demsaze cuda mam
Weku ney bê newa kewtûm û bê deng

Degeyiye menzillî Selma be sed qerrin
Be gamê tey bikeyî ger sed de firseng

Yekê ‘aşiq be xo, yek talîbî rû
Yekê mecbûrî bo, yek mayilî reng

Xeg û zarî ke basî kewte gullzar
Keç’esto ma wenewşe, xunçe dillteng

Cîhanî kirduwe serxoş û medhoş
Lebî wek bade, xettî sebzî wek beng

Meger xwênim sîcafî bê berî dem
Ke wa ew damenem kewtote ber çeng

Dillî seng e, debarê gull be seriya
Ewî gull bû, zemane daye ber seng

Ke bote doşek ezfaru l-meniyye
Le naehlan ewendem dîwe serçeng

Bitan emrro le fezllî ême deduwan
Ferreng îşî çi bê Mehwî be ferheng!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî H

**- 1 -**

Saqî, ey mayeyî tereb leb, perçemit reyhanî ruh
Nîm xendê ke le xunçe, derxe serçaweyî sebûh

Pirsişê ka hallî zarî ême, zarî kirdewe
Lew didanane ke dedirewşayewe necmî fitûh

Lêwî derxist û be nasîh lêwe lerzeyî xist eger
Bê tebessum ka debête afetî tewbeyî nesûh

Bêminet rizqêk e xem, bimirim le birsan, ew dexom
Tefre naxom û telleb nakem le dinya qûtî rûh

El-hezer Mehwî le newheyî bêgunahan el-hezer
Awî çawî bo cîhanî da be qirr tofanî nûh

Ke têxit dill deka du qed, deda tebşîrî qed efleh
Detûsêtin le sefheyî sîne tefsîrî elem neşreh

Eger ew şoxe saqîbezim e, baqill qazî û mufetîş
Debê bibine qedehwergir le gell fetwayî wela yeqdeh

Esîrit weqtî kuştin şademerg in, nagene kuştin
Le xoşî xoşiya ruhî firrîwe ta çuwe mezbeh

Reqîb ew dameneyî dî sewze e, wek galrifî bo hêna
Nebû hallî le lefzî ‘eyb e ‘eyb e, ta witim: Weh weh

Buwe hem qafiyeyî lêwit zuban im, îttîfaqat e
Debê ‘aciz nebê, wa hatuwe, ew emleh, em efseh

Be xendeyî leb dedatin mijde la tehzen be mehzûnan
Demî têxî biroyî îfşa deka tehdîdî la tefreh

Dillî Mehwî le sîneyî tengiya her ma be dilltengî
Be cahî Mûsewî bo meş weku bo ew bo rebî îşreh


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Pîtî Î

**–1–**

Dillim derhat û to her dernehatî
Nehatî, her nehatî, her nehatî

Ke em xende û qise û lêwet heye to
Le batî şekker û nuqill û nebatî

Dedeyî wadem be qetill emrro, sibey hîç
Eto şahî, çi ye wa bêsebatî!

Le dinya cennetî xo dîwe her kes
Ke to bî hazirî wextî wefatî

Eger roj e, bitî min! Her bitê bê
Serewjêr e ke to wek roj hellatî

Ke Xizir ew xak û xollî berdereyî dî
Witî: To xak î, ya awî heyat î?

Ruxîşî kirde ew la, deyşpirsî
Be şoxî, şahî min, to boçî mat î!

Ke daxî sînemî dî, derdî damê
Witî: Morit heye, sahêbberat î

Ke şîrîn û terrî dî şî‘rekanim
Witî: Mehwî ke mîrawî Furatî

**–2–**

Seruyî rewan e qametî lawî rewandizî
Afatî can e xemzeyî çawî rewandizî

Lew nasîhanî ême ke bo dill deden be diz
Dill renc e bo nîgarim û dînî le wan dizî

Mecnûnî cîlweyî ew periyem dîwe herçî dî
Yexmagerêk e ‘eqllî le pîr û cewan dizî

Wek kareba leka keşşî cezbî husnî to
Sebrî be diziyewe le minî natewan dizî

Lêşawî bestuwe be ruwa Mehwiya siruşk
Daxo çi bê qerarî le awî rewan dizî!

**–3–**

Heqî bû dill le koya ma be sîneyî ême narazî
Ke ‘asî qesrî xuldî dî be cê ellhed nema razî

Çuwe çû, xo nehat û nadiyar e, halle mallit bê
Bes em neqde bike serfî xemî musteqbel û mazî

Bibînin ger le saqî naz û ‘îşwêk, ême deybînîn
Be meynoşî deden fitwa be mestî muftî û qazî

Le nan û aw ewa îmsakî ye mirdûş, erê zahîd
Çi ‘ucbêk e, emende bo denazî to be murtazî

Qise û basit le ‘irfan e, ke çî dinya ye menzûrit
Le ‘înwanî cewahîr coyiya yî û rû le ‘erazî

Qise ger ‘îqdî gewher bê, xerez deyka be xermuhre
Çi tesîrê le we‘zit da ye wa‘iz, wa pirrexraz î!

Mebe Mehwî be rûpêdanî yarî ‘îşwe ger mexrûr
Weku dinya sebatêkî niye îqbal û ‘îrazî

**- 4 -**

Pîrî nufûzî kirde beden, besî ye tenbellî
Derço le xanuwê ke xelel geyiye tenbelî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qeykirdinî surahî eger tê bigeyî dellê
Dill têkellhatin e le gell em xellke têkellî

Wa dill be dag im ez le reqîb, erserî birrin
Bo eklî lehmî ew sege min debime henbelî

Tersa be dînî ew yedî beyzaye bû necwa
Bo kuştinim ke destî derêna le baxellî

Dinya be tewse we demî mergî witî ke ziwake
Qerneynî dî zelîl e, le kin xot eto kellî

Zahîd çi ye, heye gebellî rîş û tûkeser
Agir nebê çi bê serî derka le cengellî!

Mehwî, qeza qisêkî xoşî wit be çarî rûs:
Diwênê gemalle gewreke, emrro yekê dellî

**- 5 -**

La ʻaşe sîwa zîkreke qelbî we lîsanî
Ey anike bename hemçû Mesîhay zemanî

Her xemkeş û hesretbeşî Ferhadî hezîn im
Lew weqte we to Xusrewî şîrînî cîhan î

Der arezûy leʻle lebit eşk çew leʻlim
Ey leʻle dil ez leʻle lebit leʻle yemanî

Rehmê ke be hallî dillî xemkêşî xerîban
Cananeyî can î, çi ye her yarî zubanî

ʻUşşaqî ciger soxte her hesret e beşiyan
Lutfî niye meʻşûqe le bo ʻaşiqî fanî

Mehwî be xem ez yar be hicran cifayiş
Lew eherubu mîn hubbîhî fe l-lahu cefanî

**–6–**

Tê dega her kes bika fehmî rimûzî me‘newî
Hîcr û wesill e nar û cenneyî ayetî la yestewî

Kêwî xem, wadî cefa teykirdin e eşratî ‘îşq
Bakî hewraz û nişêwit key debê ger rehrrewî

Nawî Harûn, îsmî Qarûn, îbtîda îma deken
Serferaz e serkiz axir, sernîgun e serqewî

Ey le ser textî xîna emrro, sibeynê tê degeyî
Ew gedayeyî to ke wa muhtacî şêwî yek şewî

Dengî pêyî ehbabî royî û pirr be ‘alem mewc eda
To be xeflet mubtela, ger neybiyeyî mestî xewî

Tif le çareyî xende, girî ye û şîwenî pê xoş e dost
Dake ey baranî eşk, ey berqî nalle, nesrewî!

Basî çi bikem bê keranî behrî pirrteşwîrî ‘îşq
Taqeqetrêkî fitûhat e, nimêk e mesnewî

Sa‘idî derkewt û ‘alem bû be Mûsayî hemû
Mu‘cîzeyî lêwî ke derxa, cumle debine ‘îsewî

Ramiyî ‘aşiq bonî ew Wehşî nîgar e muşkîl e
Mebiye hergîz em qise: ‘Enqa debê wek kew kewî

Çawî bîmarî, be we‘dî tîre baranî nîgah
Giftî da, cehdê ke ey dill, bellkî toşî ber kewî

Mehwiya! Her eşk û ahî to le cê ciwê bû newet
Çûn e ber badî fena ye derkewî ya serkewî

**- 7 -**

Gûm ke bu rahî huda, şahreh e gumrahî
Bu‘de derwîşî agir hîç nebaşid şahî


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Em mecaze çi ye, rû keyne heqîqet, ewca
La îlahet bes e ger talîbî îlla l-lah î

Rê dirabê be gedayî nefesê lew dere da
Her kesê, ta nefese ‘arî ye şahenşahî

Dukellî ahî debê daîme bigirê berî roj
Roje reş, xemzedeyî min bim û to bî mahî

Le dilla bonimit her ‘ar e le la, wa bike ferz:
Mahî ken‘anî û em mudde muqîmî çahî

Kuştimî û ew deme xwênim be edeb damenî girt
Besmelî ‘îşqim û karim be xwên e rahî

Bê xeta ew şehe lew berdere Mehwî der kird
Bo çi kes ser neçuwe şewketî sahêb cahî

## Pîtî J

**- 1 -**

Rûtî dî, lew rojewe, ger roj e sergerdan e roj
Geyiye êware, weku min, îşî qurr pêwane roj

Rehrewî rêgeyî mehebbet wa debê, her se'yetî
Ta heye lem rêge axir karî serdanan e roj

La cerem kirdûye nûrî cîlweyî ew mahe be çaw
Dewrî bo ew şem'e ye dayim weku perwane roj

Şew be ême banewîdî hatinî canani da
Ye'nî: Ey şewnim gelîne! Mijde bê mîwan e roj

Metllebit ger yar e, her se'yit be kar e daîma
Bo tewafî qapiyek wa berzed e daman e roj

Şew debê badeyî le destî saqiyek wergirtibê
Em sibeynêye le meşrîq dête der mestane roj

Ellbete Mecnûnî rojî rûmetî Leylayek e
Muttesîl, şam û seher, kewtûte em şaxane roj

Mahekem emşew şukir pirrte û fişanî xane ye
Qet le derga derdeçim ger bête em serbane roj

Em gilaraweyî le 'îşq e ta qiyamet her debê
Sed Mesîha çarî naka, derdî bêderman e roj

Roj û şew em serzemîn û binzemîneyî pişkinî
Nebuwe şiwênhellgir le 'eksî cîlweyî ew canane roj


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Rohî be fîda ke, bizane kê ye çewgan bazeke
Mehwiya çewgane ‘îşq û, goye lem meydane roj

Heqî ye roj û şew ke bêtabî deka, wadeyî wîsal
Şew bû, bê beş ma le wesllî ew serapa cane roj

Şew çi şew, lê pişkuwawî qerrneha subhî umêd
Her le dawênî yekê subha belek penhan e roj

Şew şewî mî‘racî şahî enbiya bê, wa debê
Bîperistê, bellkî sucdeyî bo biba her ane roj

Şew nebû, behrî muhîtî ‘enberî bû, nawî şew
Bû be nîsbet ew şewe, xaksiterî gullxane roj

Bo kemê lew ‘enbere, bo teqwiyeyî rohî demax
Bênî ka, wek ême, dayim çawerrêyî îhsan e roj

Min fîdayî ew zate bim, bew, ew şewe bû bem şewe
Ta qiyamet her hesed ba bew şkowe û şaneroj

To qibûllim keyî be ‘ebdî xot û bendeyî ew, Xuda!
Ta bibête xane rûbim, çend eger xaqan e, roj

Daîmen serxoyî û ser’al û sehabeyî bênîsar
Pirr be ‘îlmî to, selatî to, heta tabane roj

Bellke ta ew weqte mebrûke mubarek cêge ye
Xeyrî nûrî ew, ne meh nûrî le nawa ma ne roj

Lew selatane ke wek gewher in û dedirewşênewe
Cîlweder, lamî‘, hemû rexşinde, wek rexşan e roj

**- 2 -**

Pirsra hallim, ke min kewtim le ber pêya dirêj
Ew witî: Her sêberî dîwim buwe sersam û gêj

Ta le dewrî lêwî allî xettî sebzî bû ‘eyan
‘Aşiqanî cumle wek bengî debînim gêj û wêj

Wa muşewweş bû ke mîhrabî birotî dî îmam
Îznî xellqiî da ke dinya axire, bo dêne niwêj

Abrrûrêj e wîsalî yar û xwênrêj e fîraq
‘Alemî ‘îşq û mehebbet her birêje, her birêj

Kê le gullzarî nîşata gullbunî şîrînî naşt
Ew le kosarî xema Ferhadî kirde lalenêj

Her be tîrê xistimî, hellyawesîm, îşî minî
Bes le kurtî birriyewe, ‘umrî muje û zullfî dirêj

Nebuwe qet Mehwî, witî, bûnî min û to pêkewe
Husn e awî zîndegî, ‘îşq agirêk e dillbirêj



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Pîtî K

**- 1 -**

Çi xallî kem be serma, mamewe tak
Be lêw ah û, be çaw eşk û, be ser xak

Be dûya wêllim û eşkim depirsê
Le her dar û diyarê eyne selmak

Ciger debirrê, dill errifênêt û derrwa
Çi bêmirwet, çi bêperwa, çi bêbak

Ke kujra, şahî ‘alî cahî ‘îşq e
Heta seydit neken nageyite fîtrak

Be xencer dillimî let let kird ke bê of
Witî: Xo wa xirap û dill weha çak!

Nîsarî xakî rêget can e, fermûyî
Çe nisbet xakira ba ‘alem pak

Gulla û û agirawe bade emşew
Terebnak e mey û saqî xezenak

Witim: ‘Îşq agirî girte wicûdim
Witî: Her babetî sûtan e xaşak

Le dill da xellq û Xuwa bû, faydeyî çî
Ke dem pirr bê le îyyak û îyyak

Dezanî cîfe ye dinya, de heyf e
Weku seg em şerr û şorre le ser lak

Xuda! To lagirî lew lake Mehwî
Be cahî padişahî textî lewlak

**- 2 -**

Me'lûf e zewqî zahîd ewende be tamî nîsk
Bêgane mawe şemmî le neş'eyî xîtamî mîsk

Rutbeyî kemall e rojereşî bo ciger bexûn
Nakam e ta kereş nebuwe xûnî xamî mîsk

Xet, xallekanî dewrûberî lêwî girte naw
Em 'enberem nedîwe ke bû bê be damî mîsk

Ber xîdmetî xubarî rehî yarî min: Seba
Dênê hemû demê, be du'awe, selamî mîsk

Meyllê xeta ye: Rû le xetaye bitim, billê:
Subhî bitanî çîn û xeta kewte şamî mîsk

Gerdî remî xezalî çi deştêke pêwe nîşt
Em tîbe lew temewîc eda her be namî mîsk?!

Zullfî be dewrî xallekeya dê, hemû demê
Mehwî bibîne 'enberî sara xullamî mîsk

**- 3 -**

Zemaneyî pirr te'eb detkate tîrok
Le tê nanit dedatê du beşî nok

Piyalleyî dîde le birrêz e, dilla toş
Bicoşe, sazî nalle hem bibê kok

Be nokî tîrî şoxêkî kewa çox
Le berma ten buwe cameyî birincok

Be kullmî alliya alla xetî sebz
Tirincî kewte ber pençeyî tirincok

Ger em rîş û sereyî zahîd le gell bê
Debê cennet be deştî şing û pîşok

Reqîbe le'netî, 'aşiq dekeyî recim
Le batî seg dekeyî şêrê semendok

Be xorrayî le Mehwî bes birrence
Necîb î, megire wek ho kill, begim, hok

**- 4 -**

Ew seruyî naze tewsenî hênaye taz û tek
Hesta qiyamet û felek estûnî ye gerek

Ey dill binalle, saz bide çengî bezmî 'îşq
Mey xwênî cerg e, nalleyî mehzûnî ye gerek

Emrro le kin zeman e huner bote qeşmerî
Şêrî jiyanî bo çi ye, meymûnî ye gerek!

Fîtretbillind û payebillindim nedî, be giwêş
Gerdûn ewende dûn e ke her dûnî ye gerek

Tînû be xwênî 'aşiq e, ey dill! bibe be xwên
Ew lêwe, mijde bê, dillî pirrxûnî ye gerek

Qum her debê le xwênî bigerda be ahewe
Ew mestî xefllet e lebî meygûnî ye gerek

Diliber 'eceb niye dillî Mehwiyî bedll ke bird
Eskenderî zeman e filatûnî ye gerek

**- 5 -**

Aştiyî to, torî min, bo bêsebatî herdu yek
Geywete heddî yeqîn, em du yeqîne n herdu şek

Axir em dinyaye emrî dête ser: Axir bibe
Ye'nî bes ey fahîşe 'alem be qirr de yek be yek

Nawî ew lêwe berin, dem helldepiçirrin bo du‘a
Wa le ber çawî birrînî dill heye heqqî nimek

Ew segane n spille, sebb û refzî zatî wa deken
Hîmmetî ew be‘dî rîhlet nebuwe û em dîne hek

Wer‘î Farûqî temaşa ken, witî: Naka qibûll
Xîretim jakawî ew gullbaxe bo baxî fedek

Ser ewan û ser hemû yaranî pêxember, Xuda
Darrijê rehmet hemû dem pirr zemîn û pirr felek!

Bellke serrêjêkî bê bo ême: Çawerrwanekan
Komellî cinn in û cema‘eyî îns û efwacî melek

Her debê serrêjê bê, wadeyî xîza, xiwacey kerîm
Kirdî yadî bendeganî xo be be yek-du luqmeyek

Wadeyêkit da be Mehwî: Dême seyrî kuştinit
Wextî hat ew xêre, sa mebiye le bedgo herfî pek


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî L

–1–

Ke şêx û wa'iz û sofî be cennet ben ged û gîpall
Debê emsalî ême bo cehennim ben sirr û sîpall

Be dersî min neşa We ş-şemsî parî tell'etit, emsall
Îcazem de mutallakirdinî We l-leylî xett û xall

Le çawim xwênî carî kird û hem rengî le rû birdim
Em aşûbî dill û dîn e be lêwî all û çawî kall

Ke seyrî ayneyî kird û le paşan em kelameyî dî
Witî: Min hem be bê tîmsal û em şî'rane bê emsal

Zubanî wa'izî bêdill dirêj e derheq ehlî dill
Becêş e, xeyrî ew milpane kê bê hellgirê oball!

Ke rêyî ew şahe kewte em meqame, cê be cê hesta
Witî: Em zate sahêbhall e, heyf e kewtuwe bêhall

Çi xoş e bem hemû 'îsyanewe ya rebbî bimbexşî
Bibexşe, bigire dozex xollemêşî kem bo yek misqall

Be bê yarê meçore me'rekeyî esfendiyarî nefs
Ke lem meydane da her pîrezalle Rostemî bêzall

Be xemzeyî nazewe ew serûyî naze key çuwe gullşen
Ke nêrgis wa buwe çawî spî, serûyî buwe topall

Ke bimirê 'aşiqî zarî melaîk bên û bîbînin
Dellên em baqe çîlke nagirê ya reb berê gopall

Sema‘î sazî ‘îşq û rêge bo parranewet Mehwî
Le ber qapî gelleb bê, giwê debê kerr bê, zubanit lall

**- 2 -**

Şineyî badî beharî hatewe, xoşî le to bulbul!
Be şayî hatî gull kokî ke sazî çehçeçe û xulxul

Çemen her serû û nesrîn e le terzî xwabgeyî şîrîn
Serî kêwane yekser wek kenarî kohke n her gull

Çi şorêkî cinûnî pêwe ye bayî em beharane:
Le şara her zirreyî zincîr e, sehra şorrişî bulbul!

Debînî qale hiwe l-llahu xwênekanî kuncî mizgewtan
Riwe û sehra, ke debiyen wa surahî hatewe qulqul

Debînim sîbhe der destanî milkeç bû letekiyana,
Le sehnî gullşena sermest û destemilanî şîşeyî mul

Hemû xwênî şehan û tacdaran e le bin xaka
Ke wa hewrî beharî serzemînî pê deka gullgull

Zubanî lall e, bo heyran e, hallî bo perrêşan e
Le sosen defikirim Mehwî, le wez‘î nêrgis û sunbul

**- 3 -**

Perwaneyek be bilbilî wa wit ke bu l-fizûl
Sûtan e îşî ehlî mehebbet, ne hûlehûl

Çawî le we‘dî kuştinî min çawî dizîwe
Xûnkarî wa debê le qseyî xoyî neka nikol

Bem îxtîsase sa serî min bo negate ‘erş
Hat û le serimî da, witî: ebeden bîma ye’ûl

Wek dêwî le‘netî ke kelamî qedîmî bîst
Zahîd ke basî ‘îşq ebîsê, dête cûlecûl


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Seccade mey piya rijaw im û ‘uryan û leşbexûn
Niwêjim mezenne wa ye le mew la biken qubûl

Derçû le heddî xaye ‘urûcî decacîle
Ya rebbî to bikeyî ke bika Îseyek nizûl

Zallim! Siibey be zerre hîsabit le gell deken
Emroş, eto mebûre, hîsabit bike be pûl

Rêgeyî huda terîqetî ‘îşq e, de Mehwiya
Werin û piya birron û sellû ‘ela l-resûl

Her em terîqe bû be hemû sehbî girtiyan
Royîn piya heta geyine mertebeyî wisûl

**- 4 -**

Heyatim serfî ‘îşqit kird be umêdî fe men ye‘mel
Be hîcrit kuştim û netkirdewe fikrî we men ye‘mel

Cemalit heyf e derxeyî bo kes û nakes, witim. Fermûyî:
Celalî husn e êmeyî kirde şahenşahî la yus’el

Witim: Em ‘aleme dilliyan esîrî xemzet e, bes bê!
Witî: Key bote qûtî şahbazê pirr bekef xerdel!

Musebbîb hez neka, pirr ‘alem esbabit perrê kaye
Feqet çarî niye qet yek be dû bînînî mam ehwel

Be çî, bo çi em xirûr û kîbr û naze, debiye tozê xak
Be esll û fesill enazî? Çorre awêk esillt e û ewwel

Pelî dawênî pakit girtinî bo bû ziyad ewca
Le meydanî mehebbet da eger Mehwî kira pel pel

Be cê mawim le gell min hesreta, meksim le ser bayek
Be carê haje bênim Mehwiya wek darekeyî serkel

## Pîtî M

**- 1 -**

Nallem le sîn e, hem le dillim derd û xem heram
Bê, bê to bezmî ‘işret û ‘eyş er nekem heram

Î‘lan e: ‘Aşiqanî bekoya neken guzer
Fetweyî çi mezhebêk e: Tewafî Herem heram!

Cobar e, lalezar e, were ser çemim, witî:
Aşûb e em behare, buwe seyrî çem heram

Xwênawî cerg û nalleyî dill ger ‘eta kira
Noşînî mey, sema‘î neye û zîr û bem heram

Ew tekiye sebbî ‘îşqî tiya bê, tiya mebe
Bo sunnî ye tewettunî mullkî ‘ecem heram

Ger agirî mehebbetî şik bem le dozexa,
Ew dozexe beheştim e, cennet dekem heram

Bo seydî Mehwî, ew muje îmayeka, bes e
Sehrayî ulfet e ke le nêçîrî rem heram

**- 2 -**

Birrwane sûtinim, were birrwa ke min nemam
Perwanem îtirim niye perwa ke min nemam

Ew newnemame key berî mîhr û wefa deda
Bo min, le destî cewr û cefa da ke min nemam!

Bazarrî derd û xemkedeyî endowe û kuncî xem
Bê rewneq û nîşat û sefa ma ke min nemam


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Manim ewende pirr feterat e, ke qewm û xwêş
Umêdî her be ‘efû we, Xudaya, ke min nemam

Çiqllî mezarî min çeqiye damenî, çi sûd
Şûmî be rokî bextimî berda ke min nemam

Ew şoxe her ke ne‘şî minî dî, qiyamî kird
Çî bim min? Em qiyamete hesta ke min nemam

Mehwî ke xemî ye mirdim û xem perwerî niye
Xem mayewe be bê kes û me’wa ke min nemam

**- 3 -**

Binazim min be kufrî zullfî to ey afetî îslam
Ke estobendî cîzyeyî xiste mil îmanî xas û ‘am

Be def‘î sîxnî kirdin le zahîd raxîbî mey bû
Keçî saqî witî: Nadem be kemfam ez meyî gullfam

Le rojêkî felek saqî buwe, tê fikre lem bezme
Qedeh aşame her nadan û her dana ye xûn aşam

Fisaneyî min buwe zîneyî mecalîs, aferîn ey ‘îşq
Çeha bê namûxamî wek minit kirdote sahêb nam

Be hîret lew gullendamem ke wa badamî ye çawî
Dillî nazik weku gull, hem req e wek tiwêkillî badam

Binagoşî le çînî zullfiya derkewtibû, det wit
Eme bazî spiyî subh e, çuwe bin ballî zaxî şam

Be Mehwî kê xeber da bo sefer çû ew dilarame!
Hicûmî xem be carê hat û yekser barî kird aram

**- 4 -**

Diyarim deyrî ‘îşq e, cê be sûtin bê le wê degirim
Ke min miştê çill û çêw im, be çî bim, kellkî kê degirim!

Negeyiye damenî destî du‘a, ca debime xakî rêyî
Terîqeyî goşegîrî berdedem, emcare rê degirim

Ke dadî ye’sî xomim birde la, em ‘arife tund bû
Witî axir sibeynê cejn e, xwênî to le pê degirim

Le rûsûriyî ‘îbadet lam û rûzerdî xecallet mam
Be nawî sêwî nawim baxewan û min behê degirim

Leserxoçûn e, şeydabûn e, qiwopêwan e, sûtan e
Heta mirdin, mehebbet îşî zor e, rêzî lê degirim

Çi şoxe agirim tê berdedat û pêm dellê: Ya şêx!
Be xaşakî dewit şu‘le, ‘esam e destî pê degirim

Ke sîneyî rêşimî bew têxî naze encin encin kird
Witî: Pejmurde ye em lalezare, awî tê degirim

Le padaştî qiseyî serda heme ah û henaseyî germ
Kesê şêtane berdim tê girê, min berqî tê degirim

Şukir huşyar e Mehwî, tê dega dinya xerabat e
Ke bedmestî bika ehlî, xirapeyî boçî lê degirim!

**- 5 -**

Le nakeskariya, xakim be ser, royî be ba ‘umrim
Xuda! To bimijyêne ta le  ber qapî kesê demirim

Be zayi‘ çû le ma la ye‘niya weqtim hemû, ye‘nî
Debê weqtê le bî l-weqtê bixwazim da tiya bimirim

Ecel dewrim deda: Hazir be! Wadeyî dewrûteslîm e
Minî xeflletzede hêşta xerîkî mes’eleyî dewr im

Xeyallî pûçî dinya wa demax û dillimî pêçawe
Qiyamet, her meger rojî qiyamet bêtewe fikirim


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Le pê kewtûm û nefsim bo hewa deşnê weku mindall
Le ber pîrî serim xoyî nagirêt û taze pê degirim

Çi ye sûç û gunahî? Boçî deykate cezaxane?
Le qebir hellken, heta rojî ceza de'wa çi ye qebrim

Sibeynê yuhşeru l-mer'u we, bira gel, firset e emro
Teberra bin le min, ba kes nebê heşrî le gell heşrim

Le min nazanim îtir nefsî bedxo çî dewê Mehwî
Ke bedkirdar û bedreftar û bedefkar û bedtewr im

Meger ber mewcî behrî rehmetim xa wesfî settarî
Wer ger na, zehmet e pab û newem, namumkîn e setrim

**- 6 -**

Ewî dilldar û dulberim e ewa derrwa le ber çawim
Be dûya boçî dill netiwêtewe nerrwa le ber çawim

Xerîkî hîfzî hizb el-behr e yar, ellbet be fikrêke
Xuda hîfzî bika, baqill qedem dênête ser çawim

Birîqeyî berqî cîlweyî kê cela bexşî bînayîm e
Ke qursî aftab û meh weku tem dête ber çawim

Le kin pişkûtinî xunçeyî demî, wek gull, seraser giwêm
Gullî ruxsarî derxa, nêrgis asa, ser be ser çawim

Debê hurmet bigîrê cê nezirgeyî hezretî yare
Ke naka dem be dem tofanî dem zêr û zeber çawim

Be şoxî dîn û dillimî da be tarac, êste wek sofî
Be sebheyî eşikewe hatote ser terkî nezer çawim

Seba kuhlî xubarî rêyî kesêkî pê ye dê Mehwî
Be bê hîkmet niye defirrê le êwarê we ger çawim

**- 7 -**

Be pîr ew mahewe çûm û be ser çûm
Perî bû, ew nebû, şew bû, be ser çûm

Tellê nêrgsim û baxî hîretim pê
Be ferr hat û weku gull zu be ser çûm

Gilleyî pêşim le ser ser hem buwe bar
Ke dî min dulberim hat û be ser çûm

Dezanim badiyeyî ‘îşq e xeternak
Keçî her çûm, eger mam û eger çûm

Le hînî nez‘î roha, rohî ‘aşiq
Witî: Oxey le mîhnet xane derçûm

Be oxirkirdinî min bûme qeqnes
Ke ew çû bo sefer, min bo sefer çûm

Witî: Qet wa meye, min wa we her dêm
Nehat ewa wa qet û min wa we her çûm

Şukir murim buwe pamalî mîrê
Be bê namî jiyam û namewer çûm

Xemî qatîlim e Mehwî! Munfe‘îl ma
Le heşra kifnî xwênawî be ber çûm

**- 8 -**

Le basî meynet û derdî derûnî boye dem nadem
Le xwênawî dillî pirrxem ke sînem mewc eda ta dem

Xemim dêtê ke bo wek kodek agir ber dem e kaxez
Le bo nusînî xemnameyî dillim herga qellem dadem

Hele, parranewe emro, zuban û dill le kara ye
Zubanawer ke besteziman e sibheynê ke quça dem


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Be heq her heq, be naheq naheqim wituwe le rojê bûm
Weku Mensûr eger bîşimkujin nakem le heq la dem

Billa gull ateşî tê berbibê, perwane bê bulbul
Debê her biçime bax û razî dill şemmêkî ber ba dem

Sibeynê werine seyrî kuştinim wadem çeha dawe
Le ser wadeyî diroyî ew nadem îtir wade, qet nadem

Witim: Ger hallî Mehwî tê bigeyî rem bem hede nakeyî
Witî: Ew tê negeyiwe, min perî m û ew benîadem

**- 9 -**

Esîr û seydî qeydî keyd û şeydî nefsî emmare m
Le dest em mare bedçare, çi ye çarim, Xuda çare m!

Le hefta têperrîm û hefteyek bo dîn û bo dinya
Be karî xom û karî kes nehatim, wey çi bêkare m!

Çi xoş weqtê bû ew weqtem le goşeyî bêkesî da bûm
Weku hayim le deştî nakesî da êste aware m

Be naxûn suretî yarim sefheyî sîne nûsîwe
Le heşra weqtî neşirî name kirdin, minim û sîparem

Serapamî ber eşkenceyî ‘iqûbet girtuwe dewran
Le ber bêdestî ye wa tê degen xellqî ke bêçare m

Le ceybim da eger yek pare şik nabem, çi perwa me
Xuda ger qabîlî dîbim heta ser ceybî sed parem

Ne şeytan û ne dewran û ne xizmanim be min naken
Ewî nefsî xesîsim Mehwiya kirdûye derbarem

**- 10 -**

Be nûrî bade keşfî zullmetî teqwa nekem, çi bikem!
Be şem‘êkî weha çarî şewêkî wa nekem, çi bikem!

Le xezneyî dillim da herçî heye, her daxî sewda ye
Desa em neqde derdî ‘îşqî pê sewda nekem, çi bikem!

Le gell destî mela rê nakewê zunnarî zullfî yar
Weku Şêx îxtiyarî mezhebî tersa nekem, çi bikem!

Le rêyî ew şoxe da xom kirde xak û pêyî nena pêma
Desa xakî hemû ‘alem be ser xoma nekem, çi bikem!

Demêk e şarî pirrşorî mehebbet mat û xamoş e
Be qanûnî tecennun şorrişê înşa nekem, çi bikem!

Le çawanim nema bo giriye, nobeyî secde ber derî ye
Siyasallim nebare, niwêjî îstîsqa nekem, çi bikem!

Le ser tom duşmin e dinya, qeziyyem mani‘u l-cem‘ e
Ke terkî to nekem, terkî hemû dinya nekem, çi bikem!

Becê mawim le yaran, nabecê mawim. Ecel, zû be!
Be mirdin lem qisûrî jîne îstî‘fa nekem, çi bikem!

Ewa Leyla be rojî heşir eda wadeyî lîqa Mehwî!
Heta qamî qiyamet, ah û waweyla nekem, çi bikem!

**- 11 -**

Bîbiyê, ya neybiyê, min dad û bêdadê dekem
Giwê bidatê, ya nedatê, ah û feryadê dekem

Heqqî îxlas e becêhênanî adabî xilûs
Pê bizanê, ya nezanê, min be dill yadê dekem

Bêstûnî ‘îşqî şîrînêk ewa hatote pêş
Ger le heq bêm û neyem, teqlîdî Ferhadê dekem

Awî têxî wefqî her tuşne lebêk e, min nebê
Kar ger bê ya nebê, lem mezlleme dadê dekem


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dersî ‘îşqim her le kin perwane ya bulbul buwe
Bîgemê ya neygemê, her meşqî ustadê dekem

Kuştinî îsfendiyarî nefs e besteyî rayî pîr
Ger meded ka ya neka, lew şahe îmdadê dekem

Bem nizîkane le berim e Mehwiya! Rêgêkî dûr
Bibête destim ya neyê, her koşişî zadê dekem

**- 12 -**

Tereb ken, şukir zorî hênawe xem
Teweqqe‘ zewalen îza qîle tem

Bes emro billê min sibey wa dekem
Hemû “wa dekem”-te sibey we endem

Zimanit ke bibirrî qiset dê be kar
Qellem dadedem, pendî xo dadedem

Be bê cê kesê bê bika xeybetim,
Segî har e, dê demgezê pirr bedem

Lecêmanewe tiriş û tallit deka
Tirê bû be sirke, ‘esel bû be sem

Ze‘îfî minî kirde pûş, êstekeş
Le min her deken em xezalane rem

Le koya minî girte ber tîrî te‘in
Reqîb îşî ye qetllî seydî herem

Le şêwet peşêwanî furs û ‘ereb
Le lehcet xûoşanî rom û ecem

Ke lew berdere bûm be qapînişîn
Minim Mehwiya warîsî textî cem

**- 13 -**

Xunçedillbûnim le hesret lêwî to ye, xunçedem!
Xunçekeyî to mer şîfa da xunçekem, ey xunçekem!

Sîneçak im wek gull û, dill pirr le xwênim xunçeweş
Bê gullî ruxsar û xunçeyî lêweket, qurbanî bem

Xulxulî bulbul le ‘îşqî gull nebû lem subhe da
Şe‘şe‘eyî ew xebxebe kewtbuwe ser em baxe hem

Lalle bê laleyî ruxt Mehwî, weku murxî xemoş
Mer be çakî sîne wek gull şerhî dûrî ka, senem


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî N

**- 1 -**

Wek gull hemû deme derewem ser be ser zuban
Wek xunçe ye derûnî, dillî gull le ser zuban

Ye‘nî, ke zîkrî zahîrim û fîkrî batînim
Her wesfî lêwit e, be hemû dem, be her zuban

Nawit debem, dillim be zubanim hesed deba
Yadit dekem, le gell dillekem dête şerr zuban

Dê basî dîde û leb û guftarî to bikem
Badam û şekker û nuqullim dête ber zuban

Her herfî kuştin e ke demî pê bipişkiwê
Em tûtiye be xûnî pijawe meger zuban

Bo şukrî cewrî ew du biro ye le qetillma
Her binmiwêke mîslî gullî şestperr zuban

Her em zubane ba‘ise bo serbirrînî şem‘
Mehwî! Serim rehet buwe bêllê eger zuban

**- 2 -**

Beharî ‘umrî ewa geyiye huzeyran
Keçî wek kodek êste deçime seyran

Debê rem ke le şar û bibime wehşî
Niye hîleyî tirim bo ramî ceyran

Le awî têxî her zamê bû awa
Birrînî min nebê her wa ye weyran

Be neş'eyî bonî gullzarî çi koyek
Le tenma murxî rohim hate teyran

Suleyman im hewallî mûrî pirsîm
Le naw emsalim ez hudhud le teyran

Birîqeyî berqî cîlweyî to le çawî
Neda bê, bo çi ye ayîne, heyran

Le Mehwî dill eger win bû weku genc
Soraxî ken le kuncî konedeyran

**- 3 -**

Hemû 'alemit e pabend û le daman
Keçî destî kesit nagate daman

Duhatî Ewropa wek ehlî dêhat
Le çareyî derdî 'îşqa cumle daman

Bira! Merdim dewê 'eqllî nelengê
Be lenceyî naz û 'îşweyî new nemaman

Le gell zanit dekewiye koşî dinya
Sibey qatîlit e, emro bote maman

Ser û samanimit pirsî, mepirse.
Serî to xoş, ne ser mawe ne saman

Xurûrî husn e fir'ewnî be to da
Reqîbî seg be çî bû bû be Haman?!

Le dinya da weku mindallî nakam
Be nakamî deçin dinya be kaman

Behane megire, lew camane camê
Kerem ke, saqiya, bigire ricaman


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Be kulfet ew, be ulfet em giriftar
Weku yek zahîd û Mehwî le daman

**- 4 -**

Nîsbet bidirê hûr û perî ger be letoçûn,
Ballîde debin ta degene ewcî lexoçûn

Em xellqe ke wa têgeyîwin geyîwine meqsûd
Rêşgawiyekî mehze, be derdî min û to çûn

Bo cîlweyî bêçûnî niye qiwetî çûnim
La hewle we la qiwwete ke min hewlim e boçûn

Bêçûn e ‘edem, pey be soraxî demî nabeyî
Fayiz bibe bem gewhere lew behire be roçûn

Muştaqî demî têxit ewende be behane n
Bo çûne fena, her be îşarêkî biro çûn

Xendêkî le xunçeyî demî to dî ke le baxa
Her lew demewe lêw û demî xunçe le go çûn

Bo qursî genim gûniye rohî çuwe Mehwî
Wek zahîd û sofî ke le bo xepleyî co çûn

**- 5 -**

Şexsêkî sahêb ehwall pirsî ke ey Filatûn!
Yûnaniyanî qewmit boçî be derdî seg çûn?

Ew zûfinûne ciwabî dabû: Be cê ye wa bê:
Xoyî daye ber şîhabî saqîb ke dêwî mel‘ûn

Batîl muqabîlî heq westa, betall e îşî
Gerdî be bade xakê bê hellbijê be gerdûn

Xurşîd e mu‘cîzeyî şer, zullmat e sefseteyî pûç
Îslamiyan hemû dîn, yûnaniyan hemû dûn

Lem kare da tikaker kê: Hezretî rîsalet
La siyema tikagir kê: Zulcelalî bêçûn

Fetih û zefer be nawî kê bê? Xelîfeyî îslam
Ebdulhemîdî xazî, sultanî rub'î meskûn

Saîl ke lew cenabe faîz bû bem cewabe
Mezmûnî pirr le hîkmet, elfazî pirr le mezmûn

Pêyî wit be sed te'eddub, ustadî bê te'essub!
Bem halle û salle layiq te'rîxî çî defermûn?

Dûbare hate guftar: Min zû witûme naçar:
Îslamiyan bifermûn, yûnaniyan telef bûn

**- 6 -**

Le meyxane, Xuda, ger ême derçîn,
Be kê beyn îltîca, bo kêhe derçîn?

Ke ême çûne cennetman be to da,
Le ême la de zahîd! Ême her çî n

Xet û zullfî be yek da dê le ser rû
Meger zeng û xeta şerrî ye le ser çî n

Le baweşima deda mewc eşkî hesret
Ke mertî girte baweş ta kemer çîn

Ewende teng û naxoş e, le dinya
Xoş e derçûn, egerçî bo seqer çîn

Serit pê lazim e, meybaze Mehwî
Debê dulber ke hat ême be ser çîn

Mehallat e le bendî zullfî derçûn
Çeha çîne, çeha çîne le ser çî n


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**- 7 -**

Xudakey! Bes ke bo dinya emende ayîn û oyîn
Temaşa ke ehîbba sax û oyîn çî hemû royîn

Le manim da nedîwe hasillê xeyrî tewehhuş min
Xuda pê da û ewaneyî lem wihûşistane zû royîn

Le berçawî bitim kewtûm emin, wek eşkî newmêdî
Heta deçime fena, xakim be ser minim û be rû royîn

Billa neyişgemê, her bo serefirazî be ser nek pê
Be rêgeyî yar da la budde mînhu we dû be dû royîn

‘Îbaret çî heye? Her (sîmiya) te‘bîrî pê lê dem
Le dinyayek ‘îbaret bê le mehzî hatin û royîn

Biro dagirtinit ‘uşşaqî pê çûne şerareyî merg
Deha merg întîzarêk in be emrêkî biroroyîn

Le beynî nûr û zullmet ameşo ser nagirê Mehwî
Nîgarim bo ye pêmî wit: Le min hatin, le to royîn

## Pîtî O

Dinya tiyatro ye, meweste tiya, birro!
Kê mayewe tiya ke nebûbê tiya, tirro!

Dinyayeke du roj e newaziş bika, siyem
Rojî gudaziş e, emete dakî sêberro

Rûtirş û rûxoş e le riwêka, le yek dema
Qehrî diro ye, mîhrî diro, herdu her diro

Piştî ke da be pişttewe, bo piştşkandin e
Emrro Xuda şikurit e, sibeynê birale ro

Pîrê nemamî baxî ciwanîmî kirde poş
Tazem dirextî tolî emel derdeka çiro

Gerdin ke çî çillêk e serefrazî ye gullî
Birrwane, çawekem, ke le ser çaw e cêyî biro

Mehwî! Be mûtû we ke le mirdin bibê necat
Royandinit le pêş e, le pêşa were birro!



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Pîtî Q

**- 1 -**

Ew deme rohim le ser leb bû le ber derdî fîraq
Hat û zû kirdim be pê şabaşî, ne‘im el-îttîfaq

Bîme kiwê? Dilber witî, ger çaw e, tofanêkî eşk
Dill, tenûrî agirî ‘îşq û xiroşî îştiyaq

Ew dû ebroye ke peywest e becût e, wek huma
Sayebanî çawî bîmar in, le ‘alem bûne taq

Mehşerê hesta ke hesta royî, royî dû be dûyî
El-weda‘êkî ewa nalleyî hezaran el-fîraq

Her şiwanê key debête hemqerînî şahî min?
Siwarî ker nabê bibête hemtekî siwarî Buraq

‘Eyşî naxoş e, serî medhoş e dayim zerrperist
Xasse her sefra ye bote murîsî talliyî mezaq

Ta le mallî dernekirdûyî em şewî sedşûkere
Mehwî azane bide to sê be sê dinya tellaq

**- 2 -**

Ewî emrro be dewrî textiya ye helheleyî mexlûq
Le dewrî ne‘şiya sibheyî debînê welweleyî mexlûq

Be pelpelkirdinî sibheyî eger bibuwaye bawerriyan
Debû qet bem hede nebuwaye bo dinya peleyî mexlûq

Dexate fikrî ehlî me‘rîfet şêweyî cecall el-heq
Debînê be‘ze eşxasê be dûya xergeleyî mexlûq

Weha pirr fîtne bû ‘alem ke îblîsêkî wek îblîs
Nemawe me’menî xeyrî killîşe û kellkelleyî mexlûq

Le perdeyî cîlweyekta rûnimaye şorî sed mehşer
Nîqabê la de lew çîhre, bibîne zelzeleyî mexlûq

Be awî tê geyiştîn ême dinya, her serabê bû
Hemû deşçin be xinkan û le wişkiyîş e meleyî mexlûq

Le sûqî dehir da dukanî her kes muddetî ‘umir
Guher dane be pişkilldan e Mehwî, mamelleyî mexlûq

**- 3 -**

Wek bilbil, ey to tazegullim, pirr be dillim e şewq
Wek qumrî, ey to ser û sehî, pirr be milim e tewq

Xoş e be yadî ew lebewe noşî xwênî dill
Bem neş’e aşna nebuwe xeyrî ehlî zewq

Ballat e wek elîf le hurûfatî kaînat
Mafewqî to kujayewe nawî le teht û fewq

Ew berqî cîlwe şewqî ke emşew birrî le mah
Sîneyî cîhanî bo buwe mecmer be narî şewq

Seyrî heye ‘eqîqî lebî, xet be dewriya
Bo ser Yemen le zengewe leşkir kirawe sewq

Şêrêkî pê le sîlsîleda ye esîrî ‘îşq
Merd î, bizane zînetî merdane tewq û rewq

Hatote ser eme le serit da, ser hellbirre
Mehwî em îşî xêre le ser to ye mawe ‘ewq

# Pîtî R

**- 1 -**

Le ulkeyî ‘îşqe da bê çûne ser dar
Be asanî mezane bûne serdar

Heye ger ‘îşqî serdarî le serta
Bike meşqê le waneyî çûne ser dar

‘Esayek destgîrî ême nabê
Pirrî em dare bê ger ser be ser dar

Le ber darî heda min bim, eto mest
De qazî heq billê to, Heq çi berdar

Xoşî fermo çi Mecnûn û çi Mensûr
Beşî ‘aşiq dira her berd û her dar

Ewî çû bo soraxî, bêsorax e
Xeber wa ye ke kes nabê xeberdar

Witî: Mîweyî beheşt e şî‘rî Mehwî
Xuda nebirrî le baxim darî berdar

**- 2 -**

Ey ew kese ke mestî xirûrî behatî kar!
Bew destî zore bidirre perroyek le karî çar

Her çende xertel î, le pirrê çerxî pencebaz
Detka be bazî penceyî mîqadoyî şkar

Ya marî ser xezêne! Bitirse ke gejdumê
Bew nûke çizwe pirr be demit ka le jehrî mar

Zerre tirîşqeyêk e ke kêwê deda be bad
Eşbah ewende zor e be kes nayete şumar

Pes ewropalî! Bes bigezin lêw, eme çi ye
Japoniyek muhasere da çar dewrî çar

Çarî qeder bizane niye, çende çarî wa
Bê çare ma ke bû be du pençeyî qeza duçar

Lem karûbarî çare yekê çare girij eka
Wa tê geyiştuwe ke her esbab e dê be kar

Pirr Sîbiriya, be bê mededî zatî Kîbiriya,
Esbabit er heye, niye şayanî î'tîbar

Herçî heye musebbîb e, baqêke fanî ye
Bendeyî yekê be, bes bibere 'ebdî sedhezar

Mehwî çi kes menase, binase Xuda û bes
Zîkrî yekê ke, mar e, meke basî çarûmar

Lem çare pîse, mîlletî pakî Muhemmedî
Der qel'e bê Xuda! Be heqî cahî herdu çar

**- 3 -**

Eger to rûbexallêk î le Leyla şox û zêbatir,
Minîş aşifte hallêkî le Qeys im şêt û şeydatir

Be dillme ciwênî ew lêwe, le bose neş'e bexşatir
Le kin tiriyakî ye ellbette qawe seda le ça çatir

Le koya mudde'î deymî, be îstîhza witî: Şah im!
Gedayî em koye bim, şahenşehêk im sed leşa ziyatir

Le ber dergahî ‘îşqa yeksere her kes serî dana
Eger petyareyek bû, bû le sed ‘ellame danatir

Binazim bem şehî meh seyre bo geşt û guzarî şew
Siwarêk e, Buraqî tewsen e, cîbirîlî ye şatir

Le dinya têperrî her kes be ballî hîmmet, aza ye
Le ‘uqbaş ew kese ger têperrî, bazêk e azatir

Eger em ehlî dinyaye, weku hen, rê xene cennet
Denaet zû deka ew dunye lem dinyaye dunyatir

Kesî min ger kes in, kes min nexate fikrî ew şahe
Be yadî nakesan azurde heyf e xatîrî ‘atîr

Xuda bîda be rehmet, daxî dill çawî dill e Mehwî
Be girî ye çaw eger çû, şik debem çawêkî bînatir

**- 4 -**

Muheqqeq her kesê meslekî ye heqq û heqqe menzûr
Sulûkî çûne ser dare, terîqeyî pîrî ye Mensûr

Le ulkeyî ‘îşqe da bo her kesê serdarî ye menzûr,
‘Ulûwî mertebeyî ser dar e, bote peyrrewî Mensûr

Dellê dana m û dill xoşî dexate dawî zullif û xet,
Eger ‘eqillî heye boçî hezer naka le mar û mûr!

Kemalat û me‘arîf mebiye, bê dexllî hewênî ‘îşq
‘Eceb pişkûtuwe lem cezwe nare pirr be ‘alem nûr

Be xwênim tînû we, ba noşî kat û noşî bê, emma
Le ser çî, to billê, ew lêwe more wa le min bû sûr

Wîsalit nar e, hîcirt rojereş, wek aftayî to
Le to nezdîke pişko ye, xellûz e ger le to bê dûr

Te'eccub girtimî, sofî ke tesbîhim le miliya dî:
Ke bê teqirîbe pîrêjin le beriya bê ber û bermûr

Be zerd û sûrî dinya zerdewallet lê negorrabê
Be hengî tê bigeyî, her nêşe, noşêkî niye zenbûr

Le têxî to heta Mehwî şerifiya bî şehadet bû
Xwênî bû be aw, îtir le dawênit nema mehzûr

**- 5 -**

Ewendeyî ehlî dinya n ehlî dinya, taqe rojê ger
Be qerrnê min ewende ehlî Xuda bim debime pêxember

Be kem megire siruşk û ah û nalleyî bênewayat
Ke seylî bêeman e, tîrî dilldoz e, guleyî werwer

Çi kes nabê be kes darim, niye lew berdere yarim
Xudaya to bikeyî çarim, kesêk im bêkes û bêder

Çill û çoker mede dewrim, xudahafîz nesîhet ger
Le şekweyî 'îşq û lomeyî 'eqill emin hem lall im û hem kerr

Zuban û giwê gile û pendî ne lê debiyen, ne pê debiyen
'Ebes dên û deçin bem coşe xemmaz û melametger

Le î'cazî mehebbet çar fesillim cumle bo cem' e:
Siruşkim sûr e, rengim zerd e, lêwim wişk e, çawim terr

Siyapoş in le daxî xett û xall û lêwî rû û zullfit
Wenewşe û mîskî Çîn û awî Xizir û lale û 'enber

Cigerkun, xwênî giriye berde, sîne hellbidirre
Nîgahê ke, bibîne karî tîr û neşter û xencer

Ke seyrî defterî sergeştegan û xaksaran û
Siyabextanî kirdin, dî hemû, Mehwî bû ser defter


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî S

**- 1 -**

Bipirse hallim, îhmalî wefa bes
Bitirse to le heq, cewir û cefa bes

Be kamî xeyr û bêgane, birale!
Berî bûnit le yar û aşna bes

Îlahî bê ella bê nexlî ballat
Berî bo min bella bû, her bella bes

Nizîk e mirdinit ey pîrezahîd
Were ba tobe keyn, îtir riya bes

Xuda em derdî 'îşqem lê neka kem
Heta hem bes le batî her dewa bes

Ewî ew wêllî ye burcî zemîn e
De bes birrwa mesîha bo sema, bes

Le ser têperr buwe xwênawî cergim
Be serma bêne, ey dill, macera bes

Ke min dill pirr keder im û lêlle 'eyş im
Le kin min bes biken basî sefa, bes

Ke nada Mehwiya dadê be hallit
Besî bê dad û ah û nalle, ba bes

**- 2 -**

Çi bikem, ne ew kese m ke kesim bê le la be kes
Xoşim negeyime ew kese ew min bika be kes

Ger îşî rohte, ke nebû kes be destewe
Dest hellgire le roh û mebe îltîca be kes

Naehlî em ehaliye me'lûmî min ke bû
Şukirî Xuda, Xuda bes, umêdim nema be kes

Lêwî be pirsişî çi nexoşê nepişkuwand
Derda! Tebîbî ême ke nada dewa be kes

Xurşîd û saye pêkewe nabin, de heqiyetî
Ew cîlwe wehşiye ke nebê aşna be kes

Bes bê sebeb peristî, etîbba dewa deden
Bes her Xuda tebîb e ke nada şîfa be kes

Zahîd were ruwê bikere baregahî 'îşq
'Alî cenab e, wa niye her rê bida be kes

Muhtacî merhemetî ye çi nakes, çi kes, be gel
Ew taqe bêkesêk e ke girtî Xuda be kes

Cêyî î'tirazî kes niyet û nebuwe, her kesê
La da le nabekar û hezer ka le nabekes

Ger tê bigen le gewherî dill da çi mewc eda,
Em şewçiraxe lem şewe da kes deda be kes

Heq bêjî yek gunahiye Mensûr û, heqim e min
Em qet'e ger nîşanî nedem Mehwiya be kes

**–3–**

Bêmîhr û bêmirwetîyî to her 'ela l-xisûs
Derheq fîdaiyyanî cigersoxteyî xilûs

Rehim û mirwetit nebuwe û nîşe, ba xisûs
Derheq be 'aşiqan û le derheq mina xisûs


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Têr awî kirduwe demî têxit çi gelweha
Tînû lew awe mamewe min herweha xisûs

Em ‘aleme ke muntezirî cîlweyî ew mehe n
Demirin bew întîzare hemû la bîla xisûs

Lew şoxe nîme çawî terehhum, ke mezhebî
Cewr û cefa ye, derheqî ehlî wefa xisûs

Lem şare xo hemû rewş û de’bî ademî
Yekbare barî kirduwe, dîn û heya xisûs

Namerd ewende mu‘teber in lem zemane da
Merd î‘tbarî kem buwe, merdî Xuda xisûs

Rencanî ehlî dill dill e derde bellayetî
Munkîr ke nawî ême ewende deba xisûs

Herkes le hezretê be tema hellî muşkîl e
Mehwî le hezretî şehî muşkîl guşa xisûs

**– 4 –**

Zemzem çi ye, be zemzemeyî ayat û sed hedîs
Pabûnewe le şe’nî niye tîfetî xebîs

Ehwalî rojî fîrqet û ehwallî ‘aşiqan
Lew roje da mutabîqî ye hel eta hedîs

‘Ehd û wefa nemawe ke cewir û cefaye baw
Lem ‘esr û ehle şekwe eber to ye ya muxîs

Dill let debê ke herdu cigergoşeyî Adem in
Qabîl e eşqiya ye, ebu l-enbiya ye Şîs

Mehwî be lutfî to ye penahî le qehrî to
Ya xewsu, ya xeyyasu, bîkum mînkum estexîs

# Pîtî Ş

**- 1 -**

Bes bike, ey eşkî xwênînim, be xemmazî telaş
Razî ‘îşq û derdî dill xo herçî bû kirdûte faş

Rûmetî azarî geyiyê min ke riwanîmê, witî:
Min qisem ger dillxeraş e, to nîgahit canxeraş

Şertî kird îtir le kuştin bes bika, ya reb bikeyî
Ew wefa bem şerte ka, emma le qetllî min be paş

Dill bijêwî her be derd û dax e, tezyîdî dewê
Qet meke men‘î, du‘ago se‘ ye bo zemmî me‘aş

Sîne sed let bû, serim sed daxî sewda pêwe, çûm
‘Erzî hallim kem, be îstîhzawe deywit: Çak û baş

Sengsar e zahîreyî ‘aşiq, derûnî lalezar
Sûretî me‘şûqe gullzar e, cîbîllet berd û taş

Derkî se‘b e, dem dem e Mehwî, le esrarî dem î
Çunke bo la şey’ e, her se‘yek bika derrwa belaş

**- 2 -**

Le kin min esllî niye û nebuwe ‘eyşî tenha xoş
Niye beheştî Xuda hem be bê ehîbba xoş

Le xom û lew kese xoşim dewêt û xoşî dewêm
Xudaye, xoş bibî û, to bibî Xudaya, xoş

Le zullfiya û nerrû, lêwî her le kara ye
Ew aftaye ger awa buwe, mesîha xoş


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Kesêkî herze be Mecnûnî wit: Xelîfe ke mird
Witî: Be min çî, eto bimire, çawî Leyla xoş!

Bellayek e, çi bella? Xubsî batînî hemdem
Be bênî demiye deka weqtî ʻeyşî min naxoş

Le hînî bûnî reqîba witim: Ke heyf e cinêw
Witî: Çi heyf e, dillî ew segeş bibê ba xoş

Le toş û bulbul û dêwane mijde bê Mehwî
Behare şête ke kirdûye bax û sehra xoş

## Pîtî T

**- 1 -**

Dill le ser xo çûnî pey derpeyî delîlî yar e hat
Eqill û hoş ey dill bike hazir, le pêş e kare hat

Win buwe lew rojewe lêwî heyat efzatî dî
Wa debê şerm û heya, ey aferîn, awî heyat

Bo wefakirdin be we'deyî hatinî bimire, witî
Kes niye îxtarî ka wa hatuwe wadeyî wefat

To ke derkewtî mepirse çî be ser dê can û dill
Halletî şewnim temaşa ke be weqtî rojihellat

Ger le to dinya berî bû, qewm û xowêşit lê berî 'n
Ger beratî bû, hemû 'alem buwe bab û birat

El-hezer lem çerxî keçbaze, berû çerxandinêk
Çende sulltan û şehî kirdû deka bê dest û mat

Wa ezîm pirsî, yekê şoxane ciwabî damewe:
We'izî çî?! Ser ling e destarrê kirreyî destarrî hat

Şêx û tûrrey mêzer û neqil û nuqûlî hîç û pûç
Min be tûrreyî yar esîr im, ew be kollê torrehat

'Enberî sara witim zullfî, nebatî mîsrî lêw
Zullfî alloza, witî lêwî ke nawî min nebat

Ew nehatin, derd e; daxî ew nehatin, derdeha
Kes be derdî min neçê, wek min nebê tûşî nehat


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ciwan û şîrîn e eger dinya, le rû da mîhreban,
Werdî xar e, şehdî zehrîmar e, ‘ehdî bêsebat

Ger bitî êmet nedîwe, boçî diwênê detperist?
Ey burrehmen, to le lat emrro ke çî wek lak e Lat

Çawyan, em ehlî dinyaye, ewende birsî ye
Padşakanî be dem da yek serî yektir debat

Abrrû yekcarî çûnî xunçe yekdem xende bû
Ger heyat ey dill dewê, şîwen ke ma dame l-heyat

Ber Xudaye û bes, le şeytanî şeqî, Mehwî penah
Pes le xedrî şeytenet pîşe mebe ber kes şkat

**- 2 -**

Kem bû wek ew deme, sîdq em deme hem kem buwe qat
Ferehî nek be diwa bê, xem û hem hem buwe qat

Meselî ‘ehd û wefa wek meselî ‘enqa ye
Piyawetî basî le kin kes meke, adem buwe qat

Le hemû cê le çi kes bênî mirwet nayê
Kerem û sîdq û wefa îste le ‘alem buwe qat

Be du beytê xem û derdî dill eger bênime ‘erz
Kesî wa ‘erzî kirê xo niye, mehrem buwe qat

Be hemû dem le seded bas û qiseyî ew deme dam
Ke demê basî bikem, kes niye, hemdem buwe qat

Be heddê bê edebî baw e, le me û la seyyad
Pekî rawî bikewê kelbî mu‘ellem buwe qat

Heqî wit ew kese: Nabem î ke nawî Mehwî
Kesî wa zîkrî ewaneyî ke le kin kem, buwe qat

**- 3 -**

Xizir eger çawî heyatî birriye awî heyat
Min le xakî derî cananeme her çawî heyat

Mirdinêkî le ber ew qapiye da merdane
Be Xuda çatir e emrro le gilarawî heyat

Tenke tiwêjêkî kişawe be rûwa qulzumî mewt
Wek hebabê be hewa bende nira nawî heyat

Eger azadegiyek bê le ‘edem da bo man,
Çî heye xeyrî be pêçî pelepel dawî heyat

Demledemnanî reqîbanî çi bêmirwetî ye
Têkellî awî debaxan e deka awî heyat

Bew hemû talliyewe şerbetî merg, ehlî heya
Xoşgewaratir e boyî êste le şekirawî heyat

Îznî çûne çemenî weslî spêra be reqîb
Mewiya bimire ke mirdin buwe mîrawî heyat

**- 4 -**

Xelasîbûnî qet nawê esîrî zullfî zincîrit
Le ber tîrit, melek bê, hellfirrînî nebuwe nexçîrit

Mujet qullabî gîra, zullfî dillgîrit kemend asa
Mehall e ber girê ya ber bibê kes kewte ber gîrit

Le nawa basî tobeyî to bû emrro ey stemgerşox
Bixe em tobe paşî kuştinî min, to bî û pîrit

Be dengî nallewem hat, ew deme roh hate ser lêwim
Billê: Ey nalle, axir êste min çi bikem le te’sîrit

Le çînî perçema nûrî cebînî dî, witî zahîd:
Ke sûta damî tezwîrim be nûrî damî tenwîrit


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Fezîleyî esill û fesill însanî pê nabê be sahîbfezill
Ke to kose yî, be to çî mame rîşî bab û bapîrit

Le xakî pakî ew berderke da gewza reqîb, aman
Derî ke, heyf e gor asin xesaret da le îksîrit

Le ber barî mehebbet asman û erz enallênin
Çî ye em de'wiyyet zahîd, cilî lê bar e gapîrit

Şukir Mehwî ke wa muddêk e nawî çûbuwe nisyan
Le zumreyî we'dî kuştin hatwana hatewe bîrit

**- 5 -**

Ceger ez zexim tu me'mûr ve dil ez xem şad ast
Emende babetî 'eyşî nedawe bo şa dest

Le sîne coşişî nallîn e, çaw e pirr esrîn
Zîmin cewr tu eqlîm derd abad ast

Qurrê bikem be sera ya be dadirrînî berok
Heqî mehebbet eda kem, bideyî Xudaya dest

Xenîmet e, be dem û destî bigire damenî dost
Le destî xotî dem e, dawiye Xuda ta dest

Witim: Niyazim e ber pêtî xem serim, fermoyî
Be nazu 'îşwe: Şehî bo geda ke nada dest

Le pê heram e zirreyî sîlsîleyî muqeddesî 'îşq
Bibê be şêr û meger hellgirê le dinya dest

Hîlakî destî henayît e, kuşte bêdemî têx,
Emin şkariyî pabestû û eto badest

Be destî xunçe demê, destî da ke bey'et bom
Çi arezûm e, le 'Îsa dem û le Mûsa dest

Be destî dû dekewin ehlî, er le pê kewtin,
Besim nedîwe le dinya, heta ku birrwa dest

Billê be ehlî hesed Mehwiya weku Hafiz:
Qebûle xatir ve lutfe suxen Xuda dad ast

**- 6 -**

Newek her çawî mest e, xoşî her mest
Be la da dê, ke dê, wek turkî sermest

Le hecleyî naz û î'zazî be sed naz
Xuda tu hafîzî bî, hate der mest

Be dûya şêx û sofiyî mestî 'îşqî
Le rêya kewtûn meste le ser mest

Nîgahî mestî ta mestanî rê da
Nema lew cêge rêgeyî kes le ber mest

Binazim bew piyalleyî çawî meste,
Be yek pirşingî 'alem ser be ser mest

Le ber hukmî nîgaya qate huşyar
Heta çawî bika birr, mest e, her mest

Witî: Seyrî der û deştim nemawe
Le çawim mewc eda, pirr deşt û der mest

Be cuzmeyî nawî em nawe be çî bem
Be neş'eyî ew beşer hem bu l-beşer mest

Denasê badekeyî, meqsûdî heşir e
Dellê: Mehwî binû to ta seher mest

**- 7 -**

Xeramî naz eger hênaye lence serwî mewzûnit
Weku Leyla, le ser rê pirsişê ke hallî Mecnûnit

Detirsim gerdî xwênî min le şîşeyî gerdinit nîşê
We ger na, xem niye bimirim le hesret lêwî meygûnit

Xeramit çûye bax û serwî ber badî xecallet da
Gullî herwek dirrik allawne dawênî wajûnit

Ke mendî zullfî wek ebrêşmî xawî nîgarêkit
Le dill alla xeyallî xaw e dill lew dawe berbûnit

Heyatî taze dête berim û rohim derdeçê, werna
Sedayêkî niye wek mewcî gewher hatin û çûnit

Le her şî'rê le dîwanit decoşê neş'eyê Mehwî
Sedayêkî le yektir ciwê deda her tarî qanûnit.

Le çendûçûnî dinya da be zayî'çûnî 'umrim çend!
Xudaya bes be zayî' çim, be heqqî zatî bêçûnit!

**- 8 -**

Be dem mewcî xwênî eşkewem, birrwane çon im bot!
Derûnim keylî zûxî derd û xem, birrwane çon im bot!

Reqîbî seg hezî bû, kuştimit, seyrî ke çon î bom
Du'a bo dest û têxit min dekem, birrwane çon im bot!

Be xeddarî newek nawit berin, bim'encinî, qet min
Şkatî cewrî to ber kes debem? Birrwane çon im bot!

Henaseyî agirînim birdewe ber, ta derûnim sût
Be nall e ta dillit sexllet nedem, birrwane çon im bot!

Biyanû bigire, şêweyî xot bişêwêne be min kuştin
Weha çawî bedit lê la dedem, birrwane çon im bot!

Be awî giriye herdem nawî çawim şuştuwe, nek cêt
Be xwên axuşte bê, to, çawekem, birrwane çon im bot!

Xemî xoşî niye Mehwî le dilliya, her xem to ye
Le ʻîşqit da dekem xem bo bexem, birrwane çon im bot!

**- 9 -**

Îttîfaqê, aftab anê muqabîl bo ber rût
Afetêkî dê, nema tabî, biwestê ro be rût

Diyare xo perwane her sotan e esllî muddeʻayî
Boye êmeş ʻaşiq în, ey şexsî ateş xo be xot

Em fîzaʻet be dwe we, heqit e ke napirsî çi ye
To yekê daîm, hezarêkî weku min dû dût

Ey mehebbet! Agirêkî hênde xoş û dillnişîn
Ew keseyî sûtût e, her ew hewill eda bo sû be sût

Em şerareyî fîrqete mexlûqî wa kirde kebab
Malîkî dozex dillî bem ʻalemî nasûte sût

Subhî mehşer bû, witit: Subheyî zû we wadeyî wîsal
ʻAlemî kuşt întîzarî hatî wadeyî zû be zût

Bo le basî zullfiya Mehwî nebête mûşkaf
Roh û dilliye muddete l-ʻumrî esîrî mû be mût

**- 10 -**

Demit çî, pirr le durr, durcêkî yaqût
Nîşane û morî çî, xettêkî zimrrût

Be giryanim, weku gull, pê kenî yar
Le baxî min be bariş xunçe pişkût

Qibûllim keyî eger, lutfêkî zor e
Be kemtir hîndiwêkî xallî hîndût

Şukir her mame we bo yadgarî
Be karî zexmekeyî şimşêrî ebrût

Le xemzeyî çawit ebrû dagire û bes
Meke bo qetllî ‘aşiq rence, bazût

Nexoşî ‘işqî lêwit wesiyetî kird:
Bitaşin darî ‘unnabê be tabût

Minî bem hall û qalle dî ke deywit:
Kitêbêkî xerîbim dîwe, perrpût

Be nîle bê nebatî mîsrî lêwit
Cilim, subhim, hemû her şame bê rût

Le nalleyî germî dill bakit nebû to
Be ahî serdî Mehwî min dillim sût

**- 11 -**

Dilldoze tîrî ahî feqîranî rût û qût
Bo kuştine hemîşe ke amad e şîrî rût

Mehfûzî to ke rû le Xuda bî le dêw û ded
Bo hîrzî to debête zirê nescî ‘enkebût

Dill zîndû we be ‘işq û, bijî to le merg emîn
Bem derde bimire, ta bibiye heyyun la yemût

Ger sengî kohsare, buwe le‘lî tabdar
Her kes be cebrî sebir û heya xwênî bû be qût

Ya reb le dozex ummetî Ehmed bideyî necat
Kem bê çi ye le kûreyî wa baweşê bizût

Deywit: Qiyamet ellbete rûmit nîşan edem
Rû derxe, ta ku rojî qiyamet hellê le rût

Ber pêyî ewim, be mêzere we, ser ke na, witî:
Mehwî tema ye bimxelletênê be tûrî pût

**- 12 -**

Xuda bîda, le hêllêkî deda, seyrî heye rêkewt
Wenewzim da, nîgarim hate xew, emşew xewim pê kewt

Be leyla we were ber qapiyî em Leylaye ey Mecnûn
Şehêk e sed serî Ferhad û Şîrînî le ber pê kewt

Witim: Awêkî rehmet, geyiye rohim agirî fîrqet
Witî: Lem dozexe zehmet ke derbê her kesî tê kewt

Le gell dill çûm û bê dill dêmewe, em gewhere ya reb
Lewê kewt û be cê ma, ya le rê da kewt û bê cê kewt

Nîgahî girte xeyr û min dillim let bû, temaşa ken
Xedengî girte kê, şeqqijnî le kiwê, zerbî ber kê kewt

Le ser şanî kesanî dî cenazeyî min, witî: Ça bû
Em îftadeş le xem risgarî bû bo xoyî û serpê kewt

Be cîlweyî ew, weku şewnim, firrî her eqill û hoşê bû
Ke sêber mehwe lew cêye hetawî lehzeyek lê kewt

Weku roj ew mehe lew dûre derkewt
Le mêwe eşk û ahî ême ser kewt

Ke ew lêw û didanem dî, be carê
Le ber çawim hemû le'l û guher kewt

Wenewzêkim şewê da, geyiye serim û
Witî: Heste, hetawit wa le ser kewt

Le kê ya reb xeberpirsî bikem min
Ke her kes bo xeber çû, bê xeber kewt

Dillim wek şêrî bêşeyî şu'legirtû
Le sîneyî pirr le sozim der be der kewt


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Be tîr emrro dirrî wa herçî pêş hat
Xuda pê dawe her kes ber nezer kewt

Le ser xo çû be dem giryanewe dill
Gerrek pirr bû ke em mindalle derkewt

Le rojawa we îmşew bê nîqab e
Mehî min, mahî ‘alem bê meferr kewt

Be xorrayî ewendem nalle kêşa
Le sînem da pisa, ma, bê eser kewt

Biroyî ew şoxe emrro têxî kêşa
Necatî da be rehmet herçî ber kewt

Be pîr ew rojewe Mehwî ewende
Be ser çûbû, weku şewnim le ser kewt

**- 13 -**

Be kes nabê bitî min aşna qet
Xezaleyî berr niye ramî wefa qet

Mehall e bêt û ew pê ser serim nê
Be tacî padişa naga geda qet

Witim: Çi bikem le bo wesllit? Witî: Kes
Be kes neywituwe ‘îlmî kîmya qet

Çi îstîxna, çi wehşîteb‘iyêk e
Nepirsî to hewallî aşna qet

Le yadit derneçim bes, pes hewesit e
Le derheqma meke xeyrî cefa qet

Hemû bîsîmlî ye, her min nîme bîsmîl
Nebû karê bika her bo Xuda, qet

Hemû fexrî ke dax û derd e ‘aşiq
Meben, rîswayî ye, nawî dewa qet

Witim: Bêbake bo xunrêzî, ebrot
Witî: Têx ez birriş naka heya qet

Witî: Mehwî henaseyî agirîne
Be dem, min nazik im, nawim neba qet


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

# Pîtî Û

**–1–**

Le pirr berdî ecel bo şîşeyî ‘umrim newa bê zû
Fîdat im, dest û birdê, saqiya, camî şerabê zû

Çî ye dinya, jinêk e her şewî sik pirr be sed fîtne
Sibeynê zû be xwênî cergî ehlî dill deka bêzû

Ke dayeyî xakit axir her debê bigrête baweş xoyî,
Bike xakê be ser xota le qapî bo turabê zû

Be tabî ‘eksî ew dîdare dill sûta, muzekka ye
Ketanit ragire saz û be cîlweyî mahtabê zû

Denî teb‘î be carê ‘alemî dagirt ewa Mehwî
Direng e îltîca be ber re’î ‘alî cenabê zû

**–2–**

Le dinya da dill aramêk û aramî dillêkim bû
Be carê mallî wêranim, emîşim çû, ewîşim çû

Xwênî dill le ber çawim nebê ta key rewan axirr
Ewa royî le ber çawim ewî rohî rewanim bû

Çi hall e! Qurrbeser hetta be hallim pêkenînî dê
Be dest etwarî to we qurrbeser xom, ey dilleyî bedxû

Dill û dillber le yek bedxûtir in, sa min Xuda çi bikem
Fe la l-mehbûb yersa lî, we la l-qelbu l-şeciyyu yeslû

Le rojêkî ke ew guftar totiyî kebik reftare
Le min xaîb buwe, her nalleme wek kotirî haqû

Çi rohê kuşteyî ew balla ye, qumriyî darî toba ye
Fe ya toba lî qewmîn fî sebîlî l-hubbî hum matû

Le dûrî ew, kurre firsetit e ba zû bimirî ey Mehwî
Mebada bêtewe bo kuştinî to rence ka bazû


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Pîtî W

**–1–**

Şew kesê pirsî le xo derxistinî perwane şew
Ew witî: Natêgeyiştû! Tecrebeyî merdan e şew

Her siya bextanî ‘îşq e mezherî nûrî hudan
Şew nebê estêre mestûr in, be kem merrwane şew

Em siya roziyî min e poşîwiye ‘eybî kesan
Aşkar e setirî ehwallî gunehkaran e şew

Bo ye zullmetpoş e, nûrî ehlî cewher derkewê
Seyrî heqqî ken le ser em mah û estêrane şew

Nebuwe, nabînî le şew mehremitirê ta rojî heşir
Perdepoş e, hemdem e. Hemderdî ‘uşşaqan e şew

Şew, hemû şew çawerrê ye roj hellê, her rojhellat
Mehwe sertapa le ber pêta fîdakaran e şew

Xudperistîne! Le şew fêrî peristin bin, ke xor
Her diyarî da, be dewrî seryeda qurban e şew

Fîrqetî roj e derûnî kirde daxêkî siya
Wek minî sewdazede ateş zedeyî hîcran e şew

Ger fîraq agir hemû rojê le cergî berneda,
Bo hemû şew tîre dill, sîneyî zuxallistan e şew!

Tîregiyî wa fezilî bo nadem be ser rûnakiya
Menşe’î îzharî cîlweyî feyzî sibheynan e şew

Her le tarîkiyî şewa ye rê dirê ehlî niyaz
Razî dill îfşa biken, xellwetgehî xasan e şew

Têbige boçî be canin talîbî şew ‘aşiqan:
Nîweşew bû, we‘degahî hatinî canan e şew

Hênde sahêb sirr e, mî‘rac û şewî qedir û berat
Xasecatî ew in û mumtaz e bem esrarane şew

Her kesê talîb be durrî me‘rîfet ko kirdine
Pirr le durr deryayekî bêmehlekeyî xinkan e şew

Wek Xizir awî heyatî feyzî heq ‘afêtî ye
Ew Xuda pê dawe Mehwî! Ta seher nallan e şew

**- 2 -**

Ke lêwî xwênimî noşî, şewî xet girtî dewrî ew
Be qurbanî xwênêk im ke wa royî be seriya şew

Le eşk û ahima coş û xiroşî hewlî te’sîr e
Dezanin rêyekî dûr e le pêş. Ellbet deken ser rew

Billa rohit muqeddes bê, em û ew kirdinit bes bê
Heta axir henase ew binase, her binaze bew

Şewê Leyla be Mecnûnî weha wadeyî temaşa da:
Debê rojê bibînî min ke to rê xeyte deştî xew

Le nallînî minî îftade zahîd bo riqî hesta?
Huzûrî ahahî bû. Be xeybet ew deka ‘ew‘ew

Xuda bîda edeb hîrzu l-emanêk e ‘etiyyeyî reb
Çi bû cergî birrî xeyrî emeyî nameyî dirrî Xusrew!

Witî: Min bêm û Mehwî wa bimênê, nakirê, nabê
Hetaw û sêber în ême, debê ya min bibim ya ew!


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Pîtî X

**- 1 -**

Be surm e boye dulber xencerî mujganî da perdax
Dillî hellnagirê bibiyê le kuşte dengî of û ax

Be tîrê kuştimî, hellyawesîm, sûtandimî, rûyî
Du'a bo hîfzî ken, kê dîwiye canane wa gustax

Gull û laleyî kej û ko, kohken dênêtewe fikirim
Ke xûnî naheqî ew mewc eda îsteş le kêw û şax

Le ber qapî xerabata, ke ya reb dayime awa bê,
Meger xakê be ser da kem, bikem gahê demaxê çax

Xerabî 'îşqî to wa bê ser û saman û derwêş e
Serî bêtac e, kulbeyî bêder e, dîwarî bêsaçax

Negeyine ke'beyî amale hemû esbabî amade
Ke dest e bê 'esa, pê xaws e, yek qet'e rê qumlax

Le reşkî seydî fîtrakî çi şîrîn şehsewarêk e
Ke Mehwê! Herweku dêwane, 'enqa kewte şax û dax

**- 2 -**

Dozex le 'îşqe xallî û hennet le derd û dax
'Aşiq le heşrîşa niyetî cê dillê ferax

Ger 'azîmî ziyaretî ke'beyî mehebbet î
Rê: Çakî dill; 'elametî rê: Dax û şiwênî dax

'Îşq agirêk e berbuwe her kes debê be kes
Ger rojereş weku şewe bê, bû be şewçirax

Destim dewê siwawî esef, dîde keyilî eşk
Ya reb be duşminîşî nedeyî dest û çawî sax

Destî hena nîgar û, mije û çawî surmedar
Bo xeyrî xan û xanimefendî niye musax

Her koşiş e be kar e, eger çûbiye fenaş
Dill bû begerd û ‘alemî damen deka sorax

Her ahî ‘aşiq e demî pê bête pêkenîn
Em xunçe bew nesîme ye bîpişkuwê demax

Cobar e, lalezar e, heta çawî birr deka
Mehwî beheştî bo çi ye, çi bika le aw û bax?!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Pîtî Y

Dill firîbî dillberî dilldar, hey!
Fîtineger, hey! Rendheyî ‘eyyar hey!

Bûye yarî xeyr û min bêgane mam
Bêwefa, hey! Hey cefakirdar, hey!

Xo musullman im, be naheq xwênî min
Bo derrêjî, kafirî xunxwar, hey!

Ça niye, reftarî wa bed bes bike
Derheqî min, şoxî bedreftar, hey!

To dillit dêwane kirdim, êstekeş
Naniwênî rû, perîruxsar hey!

Qet le tîrî ahî mezlûmanî ‘îşq
To netirsî, zallimî xeddar hey!

Xeyrî bed neydî le to Mehwî etoş
Her bedit rê bê, bedî bedkar hey!

# Pîtî Z

**- 1 -**

Ew ‘îşwebaze derheqî min çare girje baz
Bêçare mawe bende, xudawendî çaresaz!

Destim ke geyiye damenî, mirdim le xoşiyan
Gerd im. Xuda bikeytewe bew rutbe serfiraz!

Î‘cazî ‘îşq e menşe’î her mu‘cîzêkî husn
Mehmûd e bende, boye buwe padşa Eyaz

Ew çawe çî deka ke hemû ‘aşqanî kuşt!
Bênaz e naz eger ber û dewrî neda niyaz

Pirsî ke hallî ça û derûn û dillit çi ye?
Her eşk û ah û dax e le gell sozî cangudaz

Meşxûllî (şerhî gullşenî raz) mi, defermuwê
Sînem ke şerhe şerhe dekatin be têxî naz

Huqqe û qellem le ber demî ye şêxî nûştenûs
Efsungerî tema ye le gell çerxî huqqebaz

Bibiye le min, dirextî (minî) le‘nete berî
Ye‘nî bike le kîbr û enaniyet î‘tîraz

Her kes tekellumî be ena l-xeyr e wek îblîs
Emrro sibeyî xîtabî ye ya eyyuhe l-bîraz

Ba zorî bê be kem megire ahî bêkesan
Bem sirwebaye ‘erşî Xuda dête îhtîzaz

Mehwî! Nîsarî rewze ke emcare neqdî can
Merg er nebû be hacîz û, hem çûyewe Hîcaz

**- 2 -**

To nebî melce'î min bî, ebeden nîme melaz
Lew dere bêt û derim keyî, be Xuda nîme melaz

Qapî û babî kesêkî ke nîşanim de, biçim,
Xeyrî qapiyî kerem û babî 'eta nîme melaz

Temî xem 'alemî dagirtuwe, bê me'wa bûm
Ber derî meykedeye û bes, lewela nîme melaz

Bem hemû tîrewe, dill sînemî dî, ew şêr e
Lerzî hatê, witî: Em bêşe nema nîme melaz

Bext e, zahîd ke beheştî buwete me'wa, min
Xeyrî beytu l-huznî derd û cefa nîme melaz

Şukrî heq ber deriyî her feqir e îqametgahim
Ber der û barî ne sulltan û ne şa nîme melaz

Bellke lew rêyewe min pey beme 'îmranî beqa
Mehwiya xeyrî xerabatî fena nîme melaz

**- 3 -**

Bote mu'îs, bote me'wa, qewm û şarê el'iyaz
Dêwî bêtê, cê be cê dirrwa be barê el'iyaz

Her kesê satê le gell ew qewme bûbê, ta ebed,
Bêtewe fikrî, le zarî dadebarê el'iyaz

Ehlî tezwîr û fesad in, Xasîbî mallî 'îbad
Mubtela bin bem bellaye, ehlî şarê, el'iyaz

Fîtnecoyî, yek be yek dane be kuştin, îşiyan
Rû be wane exllebeyî înzarî barê el'iyaz

Har û mar in, xeyrî yek yek, yekserî dêw û ded in
Îktîfa nabê bikeyî Mehwî! Be carê el'iyaz

**- 4 -**

Wa'iz le rendî meykede degirê ke î'tîraz
Razî niye be serniwîştî ezel. înnenî le raz

Bew ta'ete ke bo em û ew ye, beheştî wîst
Zahîd umêdewar e be ecrî riya riyaz

Takî riwawî xakî çi meynet zede buwe,
Pişkûtuwe le bezmî mey emşew her înqîbaz

Em şan û şewketeyî le penahî mina ye xem
Wa min derrom û dewlletî xem dête înqîraz

Wek daxî xem niye, spî ye daxî întîzar
Çawim bibîne, çaw e! Ke mutbîqiyetî beyaz

Neqşî Xuda bibîne, le xellqî Xuda gerrê
Ger ehlî îhtîrazî, le kes megire î'tîraz

Mehwî hezer le çawî nexoşî ew ahiwe
Kem sadetî l-usûdu bî elhazîha l-mîraz

**- 5 -**

Be dawe we'zî û, xoşî betawe ya hafiz
Le hellqullane kelîkî dem û liçî wa'iz

Defermuwê ke hekîm û dewa mey e û saqî
Degirinewe le nexoşî mina ke wa Hafiz

Ke basî lêw û didanî biken, be der dekewê
Nibsarî le'l û guherkirdinî demî lafiz

Le neqsî batîn eser axirî debê zahîr
Le axira şel û şêtî eqîde ma Cahîz

Çi şox e! Hatibû goya 'eyadete Mehwî
Ke royî, rûşî nedamê billê Xuda hafîz


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Pîtî »hemze«

Ke emrî fermo ew şahe be îqre'
Eger fermanî qetill e kê dellê ne'!

Qiseyî mayeyî xiroşî neş'etî ne
Du 'alem neş'ecoşa, lebiye menşe'

Bediyayä qametî mawim be pêwe
'Ela ma mîsliha Mûsa tewekke'

Be hîcranim dewit sû'u  l-ezab
Fe lemma zuqtuhu qed kane eswe'

Be sozî îşqe bone zî kemalat
Îzî l-enwar min zî n-narî tenşe'

Witît: Rakêşe mil Mehwî, seret hat
Bî sellî s-seyfî ewme'e lî: Teheyye'!

Şeref her 'îlm e, nabînî ke Eşref
Muşerref bû be emir ewwell be îqre'

## Pîtî »'eyn«

**–1–**

Şetê awî ke zahîd bo wizûyek kirduwe zayi'
Feqîre, her bayek ew hemû renceyî çuwe zayi'

Mîsalî wa ye behrê gewherî dabê be xer muhrêk
Le bo dinya ewî 'umrî ezîzî kirduwe zayi'

Heta to çûye gullşen, gull be bênî mîskî zullfit kewt
Ke wa ew renge xoşeyî sîs û hem bênî buwe zayi'

Nekewte dam û, ramî kes nebû wehşî nîgarî min
Cîhanî se'î û koşiş çû le rêyî em ahiwe zayi'

Xetî da rûmetî to, mû le çawî 'aşiqanit hat
Nemawe, çawekem, çawê nebûbê bem mû we zayi'

Muezzîn bezmî şew wek werxî bêwade deşêwênê
Hemû wextî le ême kirduwe bem qûqû we zayi'

Le bo erbabî dinya qet mede best û beyanî 'îşq
Ke Mehwî şerhî nukteyî canfiza bo mirduwe zayi'

**- 2 -**

Kelamêk e le hîkmet keyl û camî':
'Etaker her yek e, her ewş e manî'

Emet zanî, le kes bakit nema to
Zereder her ew e, her ewş e dafî'

Geda şeh, çunke la yunfna ye kenzî
Şehenşahî hemû dinya ye qanî'


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Şukir rûzerdî ‘îşqim, nûsrawe
Le ser rûm ayetî sefra’u faqî‘

Le qapî ‘îşqe da wek şah e bende
Le ser xiwan e çi metbû‘ û çi tabî‘

Usûlî dînî ‘îşq e sûtin û bes
Perrî perwane me cem‘u l-cewamî‘

Luxatî ême nalle û ah e, qet‘en
Luxeyî wa nagirê burhanun qatî‘

Ke to derkewtî nalle û giriye coşa
Niye em cîlwe xeyrî berqî lamî‘

Zelîlî hesret im, mehzûnî xecllet
Ke bo ‘umrî ezîzim da be zayi‘!

Beyanî waqî‘im kem, kê ye bibiyê
Ke samî‘ zû deka seddî mesamî‘

Dezanim çî m û Mehwî çim le pêşe
Meger ew hezretem bo bê be samî‘

Ke îşî ummetî bê heşr û neşrî
Le heşra her be we, bew ref‘ û racî‘

Le ser ew bê, le ser al û sehabeyî
Selawatî peyapeyî, bê mewanî‘

# Çiwar xiştekiyekan

**- 1 -**

Awî ʻeynim ruzab e çunke nema
Înne ʻeyneyye teskubanî dema
Neş'ebexşêk e lêwî meygûnit
Her be nawî mesîhî xiste sema

**- 2 -**

Heram e wa berin nawî lebî meygûnî to ehbab
Neken ta şust û şo sed defʻe lêwî dem be badeyî nab
Mepirsin boçî îmşew zullfekeyî canane pirr tab e
Her ew zullfe nebû emrroke kirdî ʻalemê bêtab

**- 3 -**

Demê be wîsʻetî kursî kerem ke pêm ey reb!
Zubanî pêwe riwa bê be qed hemû kewkeb
Be ʻumrî Nûhewe tewfîqî to bika îmdad
Le behrî şukirewe yek qetre bênime ser leb

**- 4 -**

Ehlî ʻîbret mawe ger, bê seyrî Nasirşa bikat
Dû le dû sê kem şehî kird û kişêkî rê nehat
Hatî wa seyrî nehatî ken ke sed tîpan siwar
Pasewanî bûn, le naw besta piyadê kirdî mat

**- 5 -**

Têgeyiştin mexze, em însane post
Xo meke bê tecrebe qurbanî dost
To mellê yek mertebe, sed mertebe:
Dişmin dana be ez nadan dost

**- 6 -**

Ez dîr mixan amed yarim qedehe der dest
Xo fîtn e bû, pîrayeyî fîtneyşî be xoya best
Wa hatewe ey yaran, aşûbî dillefgaran
Mest ez mey ve meyxwaran ez nirgis mestiş mest

**- 7 -**

Çi ye em hemû tentene û minminit
Emende çi ye fexr û bexkirdinit
Be rûçûnî awê dekeyî zîndegî
Be derçûnî bayek debê mirdinit

**- 8 -**

Şewê Leyla be Mecnûnî dewit: Binwarre hallî xot
Be xorrayî ke çonit da be ba ‘eqill û kemallî xot
Ciwabî dayewe Mecnûn: Eger taqet bibê lehzê
Le naw awêne da binwarrere husn û cemallî xot

**- 9 -**

Nesîmî subhdem! Şebgîriyê ta eskeleyî bêrût
Billê bew aşnaye: Bê çira ye Şamî min bê rût
Be hîç însanî kamîl hîç niye serbeste û pabend
Xellatî îşq e Mehwî min ke serqonîn im û pêrût

**- 10 -**

Şêxî hemewendêkî deda pend û nesîhet
Ew qurrbesereyî dabuwe ber fehş û fezîhet
Xoş hate ciwab û witî: To heqq e, feqet min
Qutta‘î terîq im, neku qutta‘î terîqet

**- 11 -**

Be teref em nexoşî bêçaret
Nigihî ken biçeşim bîmaret
Boye detinême perdekeyî çawim
Ke bipuşim ez çeşim exyaret

**- 12 -**

Ew mesxereyî zeman e be şah û wezîrî kird
Ew ketine qet mellê be geda û feqîrî kird
Kilkêkî pêwe kird û berew jûrî jûrî bird
Têyî helldeda şeqêk û serew jêrî jêrî kird

**- 13 -**

Zallimî dillreqî rûgirjî musullmanazar
Her be îza ye ke rengî bigerrête ruxsar
Berd eger ser neşkênê, be çî rû rengîn ka
Ke le pê hellçeqî ewsa ruxî gullnarî ye xar

**- 14 -**

Rolle! Ger hez dekeyî biye şarkurr
Pendî Mehwî le giwê gire wek durr
Merdî azade qet merrencêne
Kullu şey'în wela şetîmete hurr

**- 15 -**

Dillşeketî tîrî kêm? Çawî bizanê meger!
Tuhmet e her kes billêm: 'Înde Cuheynetîn l-xeber
Dilber û bêdad û naz, 'aşiq û dadî niyaz
Xall e be rûmet dira, dax e niraye ciger

**- 16 -**

Em rojhellate nukteyekî xoş û dillpezêr
Derçû le dem gedayekî mîskînî serbezêr
Dî niwêj eka xenî, witî: Her bo emane ye
Çî niwêjî ser be zêrr û çi nîskênî bezêrr

**- 17 -**

Dill fikrî kirdewe: Çi ye qîrim buwe be şîr?
Pîranî birdewe ke ciwanîmî kewte bîr
Qamet nemam û piştî weku mêw û ronî nerim
Çewtawe, req hellatuwe, wek çewtemêwî pîr


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**- 18 -**

Teb xalleyekî ciwan û le xayet beder lezîz
Derkewtuwe be teb le çeneyî dulberî ‘ezîz
Wek sêwî zîwî le‘il tiya te‘biye kiraw
Ya topî gull ke xunçeyekî derbiçê le rîz

**- 19 -**

Ehlî fezill aram û ronakî ne şew eslla ne roj
Bo niye û nabê, ke emrro rojî naehlan e roj
Fezill û cewher bote neqis, em ehle boyem fesill eken
Seg zubanî derdekêşê, çi buwe, çî tawan e roj

**- 20 -**

Heqqî be dest e ger riqî hestê reîsî Caf
Şe’n û şkohî bû be kewayêkî bêsîcaf
Min bim le batî ew le riqana sibeyî ke wa
Mahî siyame tobe dekem deçime î‘tîkaf

**- 21 -**

Niye be xeyrî emem hîçî tir umêd û emel
Le baregahî celîlî celîlî ‘zze we cel
Be cahî rohî Muhemmed le wane bê Mehwî
Cemalî pê biniwênê ewanî ca’e ecel

**- 22 -**

Perwazî cane, royinî canane, werine boç
To gorewî lepê dekeyî û min le dest eçim
Hestanit her qiyamî qiyamet niye, çi ye
Bê dexllî çeng û ney mey le mest eçim!

**- 23 -**

Eya Marif Begî ‘alem le ber desta hemû mezlûm
Le heqqî xoyî eto em xaneqayet kird ewa mehrûm
Be kul dinya be kamit bê heta heyî sade, rojî heşir
Xudayî em ‘aleme bîlkul le xufranit bika mehrûm

**- 24 -**

Her giftûgom e, keçî her dellêm û tê nagem
Her cust û com e, keçî her derrom û pê nagem
Çawim riwa û goşeyî ew ebrowem nedî
Dill bû be behrî ‘ilûm û le elif û bê nagem

**- 25 -**

Weku mehrûmî noşînî mey ew le‘lî noşînem,
Le zewqî çeştinî nêşî mujeyişî bêbeş e sînem
Gehê derdê deka derman, be qetllê geh deda ferman
Menim kez xayet hirman ne ba anem, ne ba ‘eynem

**- 26 -**

Ew şerranî, min umêdî aştî m
Pir xelet bûd înçe ma pendaştîm
Kê le baxî qudsî hellkendim, her ew
Naşitî lem şorezarem naşitîm

**- 27 -**

Cenabî Muftî efendî! Rişêneyek baran
Le dilltî şiştewe neqşî mehebbetî yaran
Xeyallî êwe be lêşawî tund û tîjî siruşk
Neçotewe le ‘eqîqî dillî wefadaran

**- 28 -**

Birînanî derûnim, çawekem, wek çawim e wêran
Le wêranî mepirse, hem der û hem nawim e wêran
Be dill razî nebû royî, le hucre hem le ber çawim
Be carê mallî dillim û xom û herdu çawim e wêran

**- 29 -**

Çû ew Fîr‘ewne hîze bo cehennem, qurr be ser Haman
Debê esbabî zûtir çûne xizmet ew bida saman
Le wane û hem le emsalî ewane, ya rebî her an
Cehennem pirr biken, cennet tehî bê bo musullmanan

\- 30 -

Çûte çim sirûyî çiman eşkim çiman
Çim li çim carî nebî bû çim çiman
Çim le bîdarî çimî bextî çimî
Çim dika dîwit li çim kimtir çiman

\- 31 -

Binûse, pîrî dillim emrî kird, îta'em kird
Le îbtîda we ke beytê munasibî dîwan
Gedayekî weku Mehwî, qelenderêkî kurd
Mîsalî padşehî furs e, sahêbî dîwan

\- 32 -

Erbabî xîna ewende xerre be zerr in
Bê bonî behar û dîtinî co dezerrin
Emiyan e meqam û besteyan naşikurî ye
Ye'nî dewerrin eger demê bê nezerrin

\- 33 -

Eger Leyla, eger Ferhad e, ta heşir her bibin memnûn
Le yumnî 'îşq e, feyzî husn e, wa bem rutbe naîl bûn
Deken reştalleyekî deştekî basî le gell Şîrîn
Deben berd hellkenêkî kêzirî nawî le gell Mecnûn

\- 34 -

Lew sawe, nûrî dîde! Ke çawim birrîwe min
Bo hatinit le rêge ke çawim birrîwe min
Haîl nema le beynî berî pêt û dîdema
Fermû ke perdekeyî sebelim hellbirrîwe min

\- 35 -

Eşkim qetarî best û henasem siwar bû
Rohim çuwe be qesdî sefer key siwar bû
Lew sergiranî naze bipirsin le ser çî, boç
Bêgane bû le yar û, be bêgane yar bû?

**- 36 -**

Em pareperistane le xoyan ke deçin zû
Dexllî ne pelî dêw e, ne bayî ballî perî bû
Aqil lin û feqet fê le gellî dîtinî pare n
Mahî newî em qewme hîlakî qemerî bû

**- 37 -**

Reşê, bo kuştinî, yek rûreşî be destewe bû
Be diziyewe witî: Fitwa de, ruxsetim fermû
Witim: Ke derdekewê zû ke em xezakere to yî
Be destî sewz û spî bu neweyî cemal û rû

**- 38 -**

Şembe bo raw. Be yekşembe bîna danê. Be du-
Şembe rîhlet ke. Hecamet bigire ger sêşembe bû
Çiwarşembe bo dewanoşîn û şembeyî pêncemîn
Bo munacat û du'a ye. Cum'e bo tezwîc û şû

**- 39 -**

Le dewrî dillmî ke dî em hemû xem û te'ebe
Derûnî keyl e le zuxaw û derd û ta be lebe
Witî: Bibê dill e! Wek to xerab û şîfte hall?
Bellê heye le min aşiftetir, willatî bebe

**- 40 -**

Dillim wek xunçe pirr xunî (fîraqî) sebzpoşêk e
Weku sunbul hewasim tefireqeyî kakollbedoşêk e
Ke şayed bêtewe bo seyrî şînî em siyabexte
Be mergî Mehwî ey ney nalleyî wey def xiroşê ke!

**- 41 -**

Yekê pirsî: Ke pêxember le gell em şewket û şane
Çi mucîb muttesîl pirrfîkret û daîm beehzan e?
Le paş elîf û ewend em ciwabe ciwaneyî dayewe şeytan
Emeyî dîwe ke ummet wa esîrî nefs û şeytan e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**- 42 -**

Mehwî ke xeyrî destî du‘a hîçî key niye
Me‘zûr e, pêşkiste nehatûte te‘ziye
Ew ecre gewreyet ke le ber çawî ew heye
Mecbûrî kirduwe ke be ser bête tehniye

**- 43 -**

Meylî tîba‘ û dill be cinûn e û be harî ye
Neş’eyî nesîmî subihdemî newbeharî ye
Bem zariye ke ateşî berdaye cergî gull
Bulbul, meger zûbaneyî dilliye le zarî ye

**- 44 -**

Zeman e be‘ze kesanê le pirr ke helldebirrê
Ewendeyî helldebirrêtin heta le kel debirrê
Be yek-du kilke berew jûrî birdewe dinya
Be taqenuke şeqêkî firrê deda le pirrê

**- 45 -**

Rêyî xiste xestexane ke yarî xiciste pey
Cêyî çawezar e Mehwî! Em esrare dernexeyî
Sayeyî humayî dewllet e kewtote ser serit
Dawênî hewrî rehmet e, miftî le dest nedeyî

**- 46 -**

Hey le jin kemtir! Mu‘ttel boçî, neyjen! Lê de ney
Saqiya! Saqit şkê, bes rabiweste, bêne mey
Ew qurrumsaxe dellên pîrî muxan e, pêyî billên
Pîrî axir şerr! Derî meyxane ta key dadexeyî?!

**- 47 -**

Be bê bezmî hizûrî to heramim kirduwe bade
Newek bişkê be neş’eyî mey xumarî derdî bêtoyî
Le mîhnet xanekeyî min da, be bê to her bira roye
Ke carê êwe napirsin le min boçî bira royî!

# Takekan

**- 1 -**

Lem ehle da ke îşî kesî pê bibê rewa:
Ya pê ye, yane dest e, we yaxo be dest û pa

**- 2 -**

Lem seraye hacetî pê bê rewa
Ya be pê, ya dest e, yaxo dest û pa

**- 3 -**

Dillim bêtab e, ehwallim xirap e
Heta tomî dilaram û dilara

**- 4 -**

Ke wa ew şoxe tîrêkî be ‘emda girte min Mehwî
Nemîdanem çi san arem be ca şukrane’e xud ra

**- 5 -**

Bike seyrî fitûhat her gerekit e to fitûhî roh
Kitêbî dill mutallakirdin e, birrwane mektûbat

**- 6 -**

Tacî serî şahan e xakî derî Sey Ehmed
Serrişteyî îman e rişteyî serî Sey Ehmed

**- 7 -**

Weqtî hemû ke kirduwe her bo wizû’ zayi‘
Zahîd be bayek ew hemû se‘yeyîşî çû zayi‘

**- 8 -**

Munewwer nebuwe lew We ş-şemsî parî tel‘etit xo dill
Mu‘etter bê de lem We l-leylekeyî emsallî xetit û xall


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

**- 9 -**

Çaw û giwê bixwaze bo îşî muhîm
Hubbuke l-eşya'e yu'mî we yesum

**- 10 -**

Her çende to Emîn î bellê, ma dillî emin
Nabê le sîhrî nêrgisî fettanî to emîn

**- 11 -**

Nawî zenexdanit le naw baxî beheşta bête nêw
Ser werdegêrrê baxewan her cê be cê bo tif le sêw

**- 12 -**

Diro ye men'î cem'î zid, nezer ken
Le bezmî em şewa rojê diyare

**- 13 -**

To be kerem tîrekeyî girtite Mehwî şukir
Ew ekerem kewtuwe, em le kerem kewtuwe

**- 14 -**

Min rojreş im û ferqî niye rojî min le şew
Sed roj eger hellê le serim, rojim her şew e

**- 15 -**

Weku serut dewê lem baxe da bê her serberz î
Weku daneyî le bin xaka du rûzî xak ber serzî

**- 16 -**

Nîgarî dîdebazî min eger rawî hewes bênê
Be 'aşiq dîde deniwênê, le nêçîrî dill errifênê

**‘Îqdu l-‘eqaîd**

Mes’ulim e î‘ane le wehhabî muste‘an
Her lew dekem su’al û dekem hemdî ew be can
Tewfîqî lê telebim e bikem xidmetê be dîn
Me’mulim e xulaseyî emalî bikem beyan

Çend gewherê le cewhere zem bew le’aliye
Nezmî bikem be kurdiyekî sîrfî cumlezan

Hem yadgarî ehlî kemall û ehîbbe bê
Hem rehnima be wane ke bê‘îlm in û nezan

Ya reb qibûllî keyî le kem em xidmete keme
Lem zerre mure laqe kulê zore ermexan

Bem laqe kulle boye temadarî cennet im
Bo xom û bo ewane be dill lem ‘eqîde da n

Karim le gell kerîm û kerîm e beha neco
Da hewrî rehmet û keremî bête darrijan

Lew hewre hellrrijê be ebed lêzimeyî selat
Ser qebir û cîsim û rohî nebiyî axirî z-zeman

Emma le be‘dî hemd û selat, îke newbetî
Metleb îfadekirdin e bo cem‘î talîban

Wacib le ser cemî‘î musullman û mu’mîn e
Bawerr biken be dill, çi xewas û çi ‘amîyan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Zatî Xuda, ke xalîqî ekwan e, her buwe
Ye‘nî qedîmî mutleq e bî z-zatî we bî z-zeman

Wacib be zat e, bûn û wicûdî le xowe ye
Ferdêkî munferîd be beqa û hemîşeman

Rêgeyî niye be seriyewe qet‘en fena, ‘edem
Şew qet degate xidmetî şemsî ziya fişan!

Xoyî û hemû sîfatî kemalî buwe û heye
Deşbê, ezeliyetî ebediyet deda nîşan

Kes pirsî ew sîfate, billê to: Heyat û ‘îlm
Sem‘ û beser, îrade û qudret, kelamdan

Îdarkî zewq û lems û şemî bo qerar eden
Be‘zêk û be‘ze munkîr û be‘zê le wefqedan

Zid û munafî em sîfetane mehalle bû
Ew xalîqe ke ragir e bo mullkî kun fe kan

Ew hey û ew ‘elîm û semî‘ û besîr e, ew
Qadir, murîd û hem mutekellîm bîla lîsan

Zîndû û bedaniş û şinewa û bebînş e
Sahêb tewan û xwahîş e, goya be her zuban

Bişzane xêr û şerr be îradeyî ew e hemû
Radî niye feqet be xirape û şerr û ziyan

Bo ebdu bo emeliyetî xulqnde, ew ewe
Tewfîqî da be ême û xezlanî da be wan

Xalîq yekêk e, kasîb e ‘ebid, em perr ew perr e
Îfiratî î‘tîzalî û tefrîtî cebriyan

Warîd buwe le şe‘nî qeza û qeder hedîs
Bawerr debê bibê be wicûbî be herduwan

Zatî Xuda sîfatî ne ‘eyn e ne xeyrî zat
Bê em sîfate qet nebuwe û qet niye be an

Nawî Xuda be şey’ û û be zat her debeyî bibe
Ew zate na ke dewrî girê şeş cîhe û zeman

Weqt û zeman û hall û cîhet hadîs in hemû
Xalîq qedîm e ellbete, mustexnî ye le wan

Xeyrî niye, be ‘eynî musemma bizane îsim
Ba Sebbehe îsmî qewmî mi‘anîd biken rewan

Zatî Xuda ne cewher û cîsm e, ne kull û be‘z e
Bêçûn û bêçigon e, munezzeh le eyn û an

Hadîs niye, qedîm e, kelamî Xuda be heq
Dem bo hedes be naheq eben zal û gumrehan

Bawerr bibê Xuda ke le ser ‘erş e mustewî
Emma be îstîwayekî bê çon û kesnezan

Her ayet û hedîsê şitêkî tiya bibê
Bitxate şubhe, ciwabit e bê conî û conan

Wek ‘eyn û wecih û sûret û enguşt û dest û pê
Wek nefs û wek nizûlî hemû şew le asman

Tenzîh eken selef, xelef emma deken te’wîl
Bo herçî nasiza ye be zatî ezîme şan

Neygirtuwe şerîk û mu‘în û jin û weled
Bo ême ye le ayetî ‘iz em qise ‘eyan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Em xellqe cumle demirin û hemûwaniyan îlah
Zîndû dekateweyiş û debînê hîsabiyan

Kafir ke xar e, babetî nar e, cehîm e cêyî
Mu'mîn gull e, ke zînetî bax e çuwe cînan

Dînî Xuda keramet e derheq be ehlî dîn
Lew neş'e da ke ya rebî bîkeyî be riziqman!

Her kes be neş'eyî ew meyî bêçûne fewzî bû
Cennet le fikrî çû le nîşat û le xoşiyan

Wacib niye le ser melîkî wacibî l-wicûd
Eslleh weya mesllehe derheq be bendegan

Zewbideyî îlahiyatî 'eqîdem ke girte nezim
La budde debê bikem nebewiyyatekeş beyan

Wek wacib e be zat û sîfatî Xuda yeqîn
Bawerr debê bibê be melaîk, be murselîn

Heq bûn û hem be heq buwe dîn û kîtabiyan
Her yek heta zemanî yekêkî diwatirîn

Em allûgorrî dîne le kara buwe heta
Dewrî yekê be dînî ewe nesxî cumle dîn

Ye'nî peyemberî 'erebî haşimî neseb
Ehmed le asman û Muhemmed le ser zemîn

Dîn û kutub nema, buwe dîn û kîtabî ew
Baqî debê şerî'etî ew ta ku yewmî dîn

'Îsa ke dête xwarewe bo kuştinî cecall
Xoyî û ewane tabi'î ew bin, muhemmedî n

Serdarî enbiya ye be kull, xatemî rusul
Sahêblîwa ye, pêşrrew e, rojî wa pesîn

Rojê ke Mekke meşrîq û mexrîb Medîne bû
Seyrî ke şerq û xerb e be nûrî munewwer în

Mî‘racî sabît e be nisûs û be xew nebû
Teşrîfî ew be cîsmî şerîf e siwarî zîn

Bo enbiya le Mescidî Eqsa buwe îmam
Nobeyî ‘urûc e ye‘nî le no qubbe têperrîn

Ta sîdre Cubreîl e emîn, î ke refref e
Xidmetçiyî em emanete ta rebbî ‘alemîn

De‘wet kiraye qesrî ”ew edna” le qabe qews
Ziyafet lîqa ye, zatî Xuda ye be dîde dîn

Te‘zîm û îhtîram eme bê, bexşiş û xellat
Daxo çi ye û çeha buwe ya wahîbî mubîn!

Ruxset dira gerrayewe pirrbar û pirrnesîb
Da pirr bika le nûrî Xuda, wek sema, zemîn

Her çawî ser bo herçî xeraîb ke dîwiye
Wek ‘erş û kursî û hemele û wek muqerrebîn

Wek enbiya, meqamî hemû la le asman
Dozex, beheşt. Ewane beheşt în û dozex în

Em çûn û seyr û hatinewe seyre, muddetî
Ser hellbirrîn û xistineweyî baz eser serîn

Ya reb be heq şerafetî ew weqt û sa‘ete
Lew rehmetî ‘umumiye êmeş beşê berîn!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mecmû‘î enbiya ke sedûbîstûçar hezar
Me‘sûm in û le îrtîkabî me‘asî hemû berî n

‘Ezlî niye peyember û qet nebuwete nebî
‘Ebd û jin û piyawî denîxesllet û muhîn

Luqman ewa diyar e hekîmêkî pak e, Zul
Qerneyn e şahî çak e, be qet‘î mellê nebî n

‘Îcazî enbiya û keramatî ewliya
Bê şubhe sabît in, be sibûtit bibê yeqîn

Hîç ewliya be mertebe nagate enbiya
Îz hum mufezzelûne ‘ela cem‘î l-‘alemîn

Be‘dî nebî çi şekk û çi şubhet nebê le ser
Tertîbî efzeleyî xulefayî erbe‘eyî guzî n

Sidîq e efçel ewwel û Farûq e saniyî ew
Zî N-Nûr e nûrî siyûm û Kerrar e çaremîn

Sidîqe zatu fezill e le be‘zê xisûsewe
Zehra egerçî zuhre ye bo asmanî dîn

Em şeş kese hebîbî hebîbî heq in be heq
Her kes ke munkir e le xîtamî mebe emîn

Efzel le paş emane şeşeyî baqî ye le de
Her lew de ye mubeşşere n emrro ke cennetî n

Wek Ebu ‘Ubeyde, Telhe, Zubeyr û Seîd û Se‘d
Hem Îbn ‘Ewf e be‘dehum eshab û tabi‘în

Ya reb le to we rehmet û rizwanî bêdirêx
Nazil bibê hemîşe ‘ela kullîn ecme‘în

Le‘net meke bira le Yezîd û rewa niye
Şer‘en ke ême milkeçî şirî şerî‘et în

Îmanî mu‘teber ber bigire, ew muqellîd e
Teqlîdî feyziya be be cezmiyet û yeqîn

Her kes ke jîr û ‘aqill e ‘uzrî niye û niye
‘Îlmî nebê be xalîqî çerx û kureyî zemîn

Tewbeyî be weqtî xerxere, îmanî hallî ye’s
Merdûd e, bew rewiye Xuda mubtela nebîn!

E‘malî çake dexllî be îmanewe niye
Emma kemalî her bewe îmanî mutteqî n

Mu’mîn nebote kafir û murted be fi‘lî bed
Ger qetill, eger zîna ye, eger zullm, eger dizîn

Emma be dill bika niyetî kufir û ‘ezmî şîrk,
Kafir debê her ew nefese û derdeçê le dîn

Ger lefzî kufirî bê be zubana le pirr be tew‘
Kafir buwe egerçî hemû heqî ye dillnişîn

Serxoş eger qise û hedeyanatî kufirî kird
Kafir debê be mezhebî ême ke şafi‘î n

Emma be mezhebî henefî keyn eger ricû‘
Tekfîrî nakirêt û be murteddî nagirîn

Me‘dûm ewa diyar e ne şey’ e û ne mer’î ye
Mebiye qiseyî ewane ke hemkêşî felsefî n

Xeyrî yek in mukewwen û tekwîn îla l-ebed
Mumkîn niye sebeb be musebbeb billê yek în


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Rizq e weku helalleke, şubhe û heramî sîrf
Behsêke ye ke zehir e em, axir, ew engebîn

Lem noş û nêşe hînî sual û ciwabî qebir
Weqtî hîsab û weznî ‘emel ba xeber debîn

Mirdû ke geyiye qebir û meqerrî, sualê lê
Dekirê le rebb û bellkî le pêxember û le dîn

Her kes ciwabî da be ciwabêkî ba sewab,
Xêratinî deken le teref xeyru l-munzilîn

Ger wa nebû ciwabî, Xudaya be to penah
Zincîr û terq û rewq û ‘ezabî buwe qerîn

Ta yewme yub‘esu ke bepakirdin e le qebir
Bo birdine hizûrî şehenşahî rojî dîn

Dîwanî gîrûdarî hîsabî ‘umûmî ye
Heywan û cin û îns û melek, ta muqerrebîn

Çeyrre û kutub be destî çep, emma wera’e zehr
Bo rastanî kar e, le kara ye rastîn

Weznî ‘emel, çi zerre, çi kowe û çi bed, çi nêk
Bê şubhe ye hemû be tirazû dekêşrên

Men xeffet e le hawiye dexwa be men xefet
‘Eyş û nîşatî men sequlet wesillî hûrî ‘în

Hetmen debê guzer be sîrata biken hemû
Çak û xirap û mu’mîn û kafir, kîh û mîhîn

Pirdêk e rakişawe be ser banî dozexa
Barîk û tîj e wek demî têxêkî ahînîn

Her kes ke xwar e, weylî ye, zû kewte xwarewe
Toba le bo ewane ke azane tê perrîn

Rêyî sî hezar sall e, we ya pazdeh hezar
Muhtacî ‘ewn e ummetî bêçare, ya mu‘în!

Lew roje da şefa‘etî çakan e cêyî umêd
Bo ‘asiyan û ehlî kebaîr le mu’mînîn

Bê şubhe enbiya, ‘ulema, ewliya, şehîd
Meqbûl e bo şefa‘e penayan eber berîn

Te’sîrî qet‘î ye be du‘a bawerrit bibê
Îd‘ûnî estecîb weku gewher le giwê girîn

Cennet, cehennem êsteke hen, zoryan be ser
Da royîwe şihûr û dihûr, ezmîne û sînîn

Em dozex û beheşte demênin îla l-ebed
Hem têşiya demênnewe ehlî an û în

Îmanî bû, necatî debê, her bibê, le nar
Qurbanî lutf û merhemetî xeyru r-rahimîn

Herçî witûme heqq e, hemû mucme‘un ‘eleyhî
Mensûsî aye, ya xeberî sadîqî emîn

Tesdîq û bawerrit be dill ewca be mane bûn
Îman e, her be we degeye ewcî yu’mînûn

Îqrarî dem xîlaf e tiya, şert e wek ‘emel,
Ya şetir e? Muttefîq ke le ser şert in ekserûn

Îslamit înqiyad e be ma ca’e bîhî n-nebî
E‘malî salîh e ke esasî siyan û dûn


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qudret bibê teleffuz e ewwell be eşhedeyn
Niwêj û zekat û roze, le bo hec be ke‘be çûn

Îman eger ziyadet û nuqsanî bo bibê
Wek workterî eşaîr e qaîlbûn be bûn

Neqsî be neqsî ta‘et e, ziyadî be du şit e:
Ya ta‘e, ya tecelliyekî bê çilon û çon

Be‘zî dellê ziyadet û bes, neqsî bo niye
Be‘zêkî ke musîrr e le ser herdu la nebûn

Bişizane hîç û bê‘emel e wek heba ‘emel
Bê niyetêkî xalîs û îxlasî enderûn

Bibiyen be înnema we el-îxlasu bî n-niyat
Hem nessî muxlisîne lehu d-dîn ya exûn!

Îxlas eger bibê fe bîha, ger nebê, debê
Kesbî bikeyî be tezkiyeyî exlaq û nefsî dûn

Wa beste ye be suhbetî kamîltirê le xot
Zîkrî dewam û tabi‘î sunneyî seniye bûn

Her em xîsale ye ke sehabeyî kîramî pê
Faîz be mertebeyî zîra l-lahî û rizwan

Her bem terîqe pê geyîwin, geyîwne Xuda
Ew zate ‘arîfane ke dana û têgeyû n

Rû keyne em terîqe, be azane, meş bira
Take esîrî mexlleteyî efsane û fisûn!

Rêgeyî se‘adetî ebediyî to le ser min e
Bîdem nîşan û dam û le ser to berêweçûn

Em nexte nezme nusxeyî îksîrî e‘zem e
Hîfzî bike, dillî biderê, bîke ezdehûn

Bîkeyte ber, dekeyte ber îstebreqî beheşt
Mehzûz ebî be hîfzî le hewlî ‘ezabî hûn

Ya rebbî ew kesane ke emrro le ‘îşqî mîm
Lem behrî nûne da weku min xerqe debin û bûn

Xerqî muhîtî rehmetî ‘uzmatiyan bikeyî
Êmeş le gell ewane sibey yewme yuhşerûn

Mehwî! Xîtamî bêne beyanateket be mîsk
Hemdî bîla xîtam û selatî le hed fizûn

* * *

Şukirî Xuda ke lutfî Xuda bû be rehnimûn
Em gewherane muntezemî nezmî rişte bûn

Her gewherêkî mehrî kurûrêkî hûrî ‘în
Her gewherêkî sed semenî cennet û ‘iyûn

Nezmêkî canfizaw û sefabexşî dîn û dill
Nezimêkî gerzî awî heyat e rewan û rûn

Lem awe her bixonewe ta xuşk leb nebin
Rojê buwe zubanekeşî el‘eteş derûn

Lem ‘eynî nezme helldequllê selsebîlî dîn
Wek agirî hesed le derûnî hesûdî dûn

Menzûmeyêkî muxteser û pirr le faîde
Zubdeyî gelê şirûh û xulaseyî gelê mitûn

Nûriye ye be me‘nî û nûbiye ye be lefz
Xetmî be dill be nûr e, egerçî be dem be nûn


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bîke be dill be wîrdî hemû dem, ke her be me
Qiwweyî dill ew dem e ke zûbanit debê zebûn

Wek sundusî le ber ke, weku rohî bigire dill
Pîrayişî zihûr e, hem arayişî bitûn

Her kes be can û dill le berî bê, le beriyetî
Ruhêkî wa ke xeybî neka reybî sed menûn

Bew rohewem, Xuda, bibeye ber hizûrî xot
Hem xom û hem ewane ke xon û kenêk xûn!

Baqî le fezllî xotewe ser rohî ehmedî
Nazill bikeyî selat û selamî le hed fizûn!

## Stayişî Xuda

Subhan ew Xudaye ke eqillî peyemberan
Derkî niyane xeyrî be berderkiya gerran

Subhan ew Xudaye ke danatirî zeman
Dêwane ye û le me'rîfetî kunhiya nezan

Subhan ew Xudaye ke kerr û biyanî 'eriş
Wek nasî qurrbeser be nenasînî mubtelan

Zerrêkî çon îhate çi ye nîsbetî le gell
Rojêkî bênîhayet û bêçûn û bêçûnan

Ta bo qisêkî derxorî tenzîhî dem debem
Her bew dem ew deme debime lêwî xogezan

Zatim niye tuxin be sîfatî kewim be 'eqill
Rohim çuwe tesewîrî zat her bikem be can

Dill bû be dûdî mehiz û ciger bû be 'eynî aw
Ahim niye dewane, siruşkim niye rewan

Ta hebuwe, ta debê muteneffîs le sîneyek
Bê îznî ew nesîmî nefes key debê wezan

Misqalle zerre çon e le ber destî qudretî,
Her wa bizane wa ye kureyî mullkî kun fe kan

'Îlmî be hebbeyê ke be sed qerrnî ke debê
Wek 'îlmî ye be qubbeyî emsî ziya fişan

Ew zerreye ke ewwellî zerratî 'alem e
Bo 'îlmî çon e, zerreyî axiryetî çonan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Herçî bibînirêt û billên û bibîstirê
Ma huwe Xuda, Xuda be Xuda ber tirasit ez an

Teqrîrî çî bidem ke zubanin be kull zebûn!
Tehrîrî çî bikem, xet û met yek qellem xetan

Şemmêkî badî subhdemî lutfî ye behar
Zerrêkî gerd û badî şewî qehrî ye xezan

Dûrî lew agirêk e be cennet deka cehîm
Rewhê le qurbiyaye be dozex deka cînan

Dûrî eger bella ye, nizîkîş e îbtîla
Dûr in le hesretan û nizîk in le hîretan

Her kes be baregahî Celal aşnatir e
Ziyatir qiseyî le wehşet û dehşet deda nîşan

Giwê kerr debê le xulxulî subhane ma ‘eref-
Nakeyî ‘enadîlî çemenistanî asman

Ehmed ke ekmelî beşer e lem meqame da
Rutbeyî kemalî ‘îczî le la ehsa ye ‘eyan

Pes min ke kemtirînî diwa ummetî ew im,
Çî m û çi qurr bikem be sera, çî bikem beyan

Mehwî! Edebxemoşî û mehwiyyet e le gell
Nesrewtinêkî, ye‘nî be dem derdewe gilan

Giryeyî bekull, be dill le xerafatî xo xecill
Nalleyî dillî şewan û henaseyî sehergehan

Her ew henase ye ke bida fênikî be dill
Bew taqe nalleye ke biga germiyê be giyan

## Parranewe le Xuda

Xudaya! Îradeyî munacatim e
Niyazî du sê ‘erzî hacatim e

Be derbarî her fezillit e îltîcam
Be rehmet nîşanim de rêgeyî necam

Be We z-zariyatî henasan û ah
Ke ber ba deden kêwekanî gunah

Be We t-torî qelbî tecella qerîn
Be We n-necmî pirr wirşewirşî cebîn

Be du (walsa) ye‘nî du mertebet
Yekê mertebeyî ‘îşq û yek me‘rîfet

Be We l-fecrî ronakî bin çînî zullf
Ke fecrêkî sadîq, be bê kîzb û xulf

Be We ş-şemsî pirr nûrî ruxsarî yar
Be We l-leylî xall û xetî muşkbar

Be We t-tînî ‘uşşaqî dill pirr le xûn
Ke bê tîn in û zerd û zar û zebûn

Be We l-‘adiyat espî hîmmet dewan
Be rêyî ‘îşq da ta seher şeb rewan

Be We l-‘esrî ew ‘esre ferrux zemen
Ke nawî be ‘esrî se‘adet deben


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Qesîdeyî behrî nûr

We sella l-lahu ‘ela ew behrî nûrî ‘îlm û ‘îrfane
Ke derkî xewrî naka xeyru ‘îlmî l-lahî subhane

We sella l-lahu ‘ela ew zatî pakî qudsî ayate
Ke exlaqî pesendîdeyî cenabî heyyî mennan e

We sella l-lahu ‘ela ew hezreteyî sahêb kemallate
Ke e‘la mu‘cîzeyî, qurbanî bim min, nûrî Qur’an e

Le tarîkiyî şewî kufra be yek dem lem‘eyêkî da
Hezarûsêsedûbîstûdu we, dinya çiraxan e

Çirayek nûrî bêçûnî mumîddî bê, debê wa bê
Çirayek destî qudret xoşî ka, bo ta ebed man e

Te‘ala l-lahu be du deh bû ke herdu ‘alemî dagirt
Binazim bem kemallî ‘ezm û hezm û şewket û şane

Le gell em îhtîşame zuhdî dinyayî temaşa ke
Ke yek let nanî co bû qûtî, ya xurma du-sê dane

Felek cahê serî xermanî ta ‘erş, ellbete nabê
Tenezzul ka ‘ilûwî hîmmetî bo denke zîzane

Muhîmmê xeyrî zatî hey le hîmmetiya niye, îlla
Le ber em ummete bêhîmmete daîm be ehzan e

Çi medhêkit bikem laîq be to ya xeyre xelqî l-lah
Minî bêxêrî nalaîq ke Cîbrîlit senaxwan e

Beyanî gewreyî xulqî kesê ayet le eşnî bê
Ne meqdûrî min û to ye, ne îşî qess û sihban e

Le Adem ta Mesîha, enbiya yek yek be qewmî xoyî
Xeber dawe: Le paş ême ke dê, ew fexrî ekwan e

Ni'ûtî xoyî û ne'tî al û sehbî wek guher derce
Le durca, ye'nî kutubî munzeleyî ew enbiyayan e

Çeha ruhban û kahîn, hatîfî xeybî be yektiryan
Deda mujde ke cennet dête dinya bem nizîkane

Ke teşrîfî qidûmî hate dinya, barşêkî feyz
Le hewrî merhemet barî, ke asarî numayan e

Rişêneyî agirî berdaye 'umrî agirî Zerrdeşt
Be berqî bû ke şeq bû taqî Kîsra bû be wêrane

Dillî sûta be Zerrdeşt û be kesrî kîsrewî. Giriya
Ewende behrî sawa nim le çawî da buwe tane

Etoş ey nefsî bedtîne, be bê cê dill mesûtêne
Le ber kisr û kemî dinya, bes e em şîn û giriyane

Hemû karit be hîle xizmetî fikrî 'ezazîle
'Eza wek pîrejin megire, diyar e karî merdane

Be zîkr û fikrî şîmeyî mustefa weqtit museffa ke
Ke basî ew sefabexş e, terebxêr e, durrefşan e

Muhemmed îbnî 'Ebullhaî 'Ebdulmuttelîb, Haşim
Sefaweyî wildî Îsma'îl û sefweyî wildî 'Ednan e

Ew e hadî subul, tenya ew e meb'ûse bo ser kull
Be we xetmî rusul, xatem ew e, tacî resûlan e

Şefî‘î rojî restaxêr e, bo hemuwan e destawêz
Ew e ew roje wek xo, ma beqa summen û ‘umyane

Le zîkrî ew decoşê re’fet û rehmet debarê hem
Re’ûf hem rehîm wesfî ew wek wesfî Rehman e

Xuda lew zîkrî û fîkrem qet neka xafill zuban û dill
Heta xunçe dill û sosen zubanî bax û bustan e

Le gell mehzî xeyallî, dill be carê bote kêwî Tor
L ekin wesfî cemallî, lêwî wasîf gull be daman e

Celal û şewketî, estoşkênî serkeşanî ‘esir
Cemal û tel‘etî, cewhergudazî zullmetistan e

Temaşakirdinêkî, rohbexşî ‘alemî mirdû
Nîgahêkî betundî, restxêzî ‘alemî can e

Le rojî herb û çerba, ru‘b û samî roh eka sersam
Eger şêrî jiyanî rû be rû bê, çarî nejiyan e

Ke weqtê al û yaranî le xidmetya debin wek roh
Heyat e, nûrî çaw e, unsî can e, mehzî îhsan e

Gehî danîştinî, kêwêkî temkînit le ber çaw e
Le weqtî royînî da, her dellêyî serwe xeraman e

Le ruxsarî letîfî, gull; le ce‘dî ‘enberînî, dill
Decoşêt û debarê, ew gulistan, em dilistan e

Lebî rohî rewan û nêwçewanî rojî lê detkê
Zubanî ta şe kerrêr e, dehanî gewher efşan e

Melahet mehwî dîdarî, helawet weqfî guftarî
Terawet nezrî gullzarî, kereşkî baxî rîzwan e

Weku yaqût û berdî tir, cenabî Ehmedî mursel
Ke tê fikrî le însan e, bellê, ma nek wek însan e

Wicûdî ew le gell baqî û cûdan her niye ferqî
Be qed roh û cesed, bê sêberî xarîc le îmkane

Meger ew sêberaneyî xezne mende kirduwe bo heşir
Çi dillsoz e ke lew germayeşa sayeyî le serman e

Le gell bêsayeyî, sayeyî xeyallî kewte ser her kes
Çi kesdar û çi bêkes, seyîd e, serdar e, sultan e

Ewî satê le ber pêya serî teslîmî danabê
Ebed malîk rîqabî gerdinî teslîmî şahane

Qul û bende û xullam û xadîm û derbanî ber dergayî
Necaşî û Tubbe‘ û Hîrqel, ‘Ezîzî Mîsr û Xaqan e

Kesê cê helltirûşkanêkî lew ber qapiye des kewt
Be ‘arî dê billên em cêge wek textî Suleyman e

Xuda pêdawekanî faîzî îksîrî suhbet bûn
Çi min, çî to, melaîk, enbiya xozgeyî be xoyan e

‘ulûwî mertebeyî ger şemmeyêkit tê geyênim min
Detirsim berdebaranim biken em tênegeyiwane

Nezer derkî ‘ulûwî hîmmetî naka yeqîn emma
Le gell baqî rusul da tê bigeyî, bo ferqî birrwane

Şefa‘eyî Nûh e bo Ken‘an û Îbrahîm e bo Azer
Resûl l-lah e şafî‘ bê çi bo xizm û çi bêgane

Be qurbanî ricayek bim ke racî bêmuhaba bê
Rica qurbanî ye’s e, bête ser xomane xoman e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Kelîm erinî ke fermû her ciwabî len teranî dî
Muşerref bû Muhemmed bê telleb bew mertebe û şane

‘Urûcî ‘îsewî ta asman û şemsî ‘alem bû
‘Urûcî ehmedî ta la mekan û şemsî canan e

Le verfî yek nefes da şew hezar ender hezaran sall
Ziyatir bellkî rê tey kat û rîc‘et ka her ew ane

Çi rêyek, bew hemû şaballewe Cîbrayilî zî qiwwe
Be cê mabû le rê, deywit: Xizim meydanî sûtane

Ke geyiye zatî barî, nûrî bêçûnî le ser barî
Ke hellgîrsa, be dewrî şem‘î xoya bû be perwane

Qibûlî lê kira herçî rica bû, pêyî dira herçî
‘Eta bû, hate cê herçî sizayî îkramî mîhman e

Le gell her xetweyek tehsîlî ‘îlmêkî ledunî kird
Le hî ew ser depirsî rohî hîkmet nûrî ‘îrfane

Be ma fîhayewe herçî heye ‘îlmî kureyî noçerx
Be qetrêkî bizane, dîdekem, lew behrî ‘Emmane

Le ber nuqsanî teşbîhim peşîmanîş im û deşllêm
Ke royî bedrî kamîl, hatewe xurşîdî pexşane

Be awabûnî nûrî win debê xurşîd û em şemse
Le awabûniya nûr û îza’eyî sed du çendane

Ewendeyî lê dezanim bem nezanî xomewe Mehwî
Be çawî ser xudabîn e, be çawî dill xudazan e

Çi çawê, kuhlî ma zaxe l-beser surmeyî sewadî bê
Munewwer bê be nûrî ru’yetî bêçûn û çendane

Çi dill, qetrêk e, emma ‘erşî Rehmanî tiya derc e
Çi dill, nuqtêk e, emma merkezî perrgarî îmkan e

Feqet çawî hesûd û qelbî munkîr kiwêr û bêderk e
Lem îdrakate, behreyî her ‘ezabî ye’s û hîrman e

Debê çaw û dillêkî pak û bêxeş mîslî awêne
Bibê ew sûret û me‘naye biniwênê kema kane

Xuda em ayneyî laîq be Bu Bekir û ‘Umer dîwe
Ke ewwell sanî û sanî şerefya be be lew kane

Le be‘dî ew duwe ‘Usmanî Zî N-nûreyn e, zu l-enwar
‘Elî şahî wîlayet, babî ‘îlm û şêrî Yezdan e

Be seriyana, be ser baqî sehabe û al û yarana
Bibarênê Xuda her an û weqt û sa‘e rizwane

Be nûrî ‘eksî pêxember ewende mun‘ekîs bûbûn
Xerîbî tazehatû deywit: Em pêxemberistan e

Xuda her mu‘cîzeyî laîq be her pêxemberê dîwe
Hemû ew mu‘cîzaneyî dawe bem serdarî hemûwan e

Yedî beyza çi ye, her taqe enguştêkî çend î‘ca-
Zî lê zahîr buwe, her yek weku mahê ke taban e

Îşareyî yek ser’enguştî mehî lew dûrewe şeq kird
Her ew enguşte bû detwit fiwareyî awî heywan e

Serî kird aw ewende leşkirêkî sêsedî da aw
Le gell awî wizû, be Xiwa ew awe abrûman e

Her ew awe buwe tofanî daxistanî kufir û şîrk
Her ew awe terawet bexşî baxistanî îmane


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Şewî hîcret ke e‘da zorî hêna, miştexakê bû
Piya çend in, debeng û kiwêr û kerr man ew le‘înane

Le naw ew gurg û wirç û seg gele derçû bî îznî l-lah
Beyarî xarewe, yarî le barî, rê le beriyan e

Weku xurşîd û meh pêyî seyriyan lê hellbirrî ta xar
Le xara seyrî kird e‘da ke wek sêber le dûyan e

Be yek-du ‘enkebût û kotirî bêfam û besteziman
Şi‘ûr û fehmî gorrî lew seg û îblîs û dêwane

Beheştî daxillî Yesrîb debê, toba le bo ensar
Be kuffaranî Mekke ta ebed ya weylena man e

Eger em hîcrete nebiwaye, dîn em şewketeyî key bû
Ke her kes tê biga bem dîne nesxî cumle edyan e

Be hîcret, xîretî dînî muhacîr, xidmetî ensar
Le qiwwe hate fi‘l û bû le ‘alem da be destane

Le feyzî hîcret e eshabî Bedir em şew hîlalî bûn
Sibey heryek buwe bedrêkî kamîl ew hîlalane

Çi hîciret, şehdî wesill, aramî can e bo hewaxwahan
Çi hîciret, bo ‘edû te‘zîbî roh û zehrî hîcran e

Hewaxwahî ‘eleyhî r-rehemetu we r-rizwanyan bo ma
E‘adîşî ‘eleyhî l-le‘neye beşiyan û besiyan e

Kesê ayeyî ‘efa l-lahu ‘enke mehzî dillnewayî bê
Me‘aze l-lahu dillî ew rence kirdin ‘eynî xusran e

Kesê bênête nutiq ask, be‘îr û sûsemar û gurg
Be tesdîqî muqîrr bin yek be yek em bêzubanane

Be emrî ya îşareyî bes dirextî rîşe dabestû
Le reg derbêt û bête xidmetî reqsane reqsane

Bey tekzîbî kesî wa, nakesê cur'et bika la şekk
Segî har e, beraz e, mulhîd e, Bu Cehil e, şeytan e

Sebîr îhbît îfadeyî bû, Hîra i'tî îleyyeyî 'erz
Ne wek ew wehşiyane pirr dene ew rohî însan e

Le destî da ke berde wirde destî kirde tesbîhat
Çuwe sê destî kew her coşî bû subhane subhane

Le rojî erbe'ada bû ke satê hepsî rojî kird
Le sehba da tilû'î pê deka dubare lew şane

Çi tîrê bû û menê co rojî xendeq qutî deh sed kes
Be tekmîlî, be rûxoşî, 'eta fermû kerîmane

Le her rêyek derroyî, bo selam û sucde ber birdin
Çi coşê bû dekewte dar û berdî ew mekanane!

Be hewrî tê megen, îlla melaîk şehperrî xoyan
Hemû dem yek deda bo sayebanî ew Suleymane

Du'a fermûnî bo 'ahat û derdî bêdewa seyr e
Le dilliya ye ke asarî îcabeyî merhemî can e

Çi ye îbra, were ser mu'cîzeyî îhya be heddêk e
Le enfasî nefextu fîhî mîn rûhî numayan e

Ewende çawî pirr bênûrî pirr nûr û munewwer kird
Ke nergis çaweçawî nûrî ye lew nûrî çawane

Xeberdanî le musteqbel qiseyî çî lê bikem ta heşir
Hemû ber tîbqî fermûdeyî ew e em waqî'atane


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Beyanî şeş-hew î‘cazî le cumleyî sedhezar î‘caz
Ewî deyka peşîman e, ewî neyka peşîman e

Eger bê mu‘cîzatî sed yekêkî bênime tehrîr
Debê her taqe beytêkim bibête sed kutubxane

Çi qabîl min be sed beytêkî kurdî, sedhezar esrar
Bidem şerh û beyanî kem le gell em eqillî nuqsane!

Ke her sîrrêkî ‘eqillî kull tiya kul mayewe bî l-kull
Ke her sîrrêkî sed ‘arîf tiya medhoş û heyran e

Feqet nabê ke derkî kul nebû yekbar e terkî kull
Be baxêke le kin bulbul gullê lew bax û bustane

Le hemziye û le burde m çunke kem dî îstîfadeyî kurd e
Minîş em kurdiyem dana le rîzî ew qesîdane

Zûbanî ‘îşqbazî xoş e ger kurdî weger tazî
Qiseyî bêsozî ‘îşq her gewher e, mehbûbî bêan e

Ela ey fexrî ‘alem rehmetu l-‘alemînî to
Le derheq nakes û kes rehm û lutfî êwe yeksan e

Bide îzin em qesîdeyî kurdiyeş bête meqamî ‘erz
Egerçî wek şi‘ûrim şî‘rekanîşim perêşan e

Mukerrerr bû qesîdeyî burde neşeyî ‘alemî pirr kird
Bifermû bem qesîdeyî kurde nobeyî neş’e pêwan e

Eger burd e, eger kurd e, eger saf e, eger durd e
Qibûlî to ke bû le birrêzî neş’eyî rewh û reyhan e

Qibûllî to nebû, sed ba ‘ereb bê, her Ebu Cehil e
Qibûllî to eger bû, fursî dused salle selman e

Minim wek ew ze‘îfe, em qesîde, ew gile dezwe
Emin kirryarî mahî la mekan, ew mahî Ken‘an e

Min im mûrî ze‘îf û em qesîde laqe kulleyî min
Feqet min hediyekem xidmet Suleymanî Suleyman e

Be çawî merhemet birrwane hediye û sahêbî hediye
Be zorî rabiwêre em keme lem kemtirînane

Qibûllî kem le kem kirdin, weha wa tê biga zore
Be to zorî bizanim, kemtirî şîmeyî kerîman e

Edeb wa ye ke lem gustaxiyaneş tobe keyî Mehwî
Xeyallî xaw e ‘enqa nakewête dawî efsane

Debê her mû zûbanê, her zûbanê dastanê bê
Bikem nextê beyanî nakesiyî xo bew zubanane

Ewendeyî zatî êwe mexzenî fezill û kemallat e
Le min da bew hedde neqs û rezaîl derc û penhan e

Dexîlî ew segî berqapiyem carê be yekcarî
Ser’efrazim bike, fermû, segî be derkî xoman e

Weku Camî dellê, em wişkhellatû min segêkî gerr
Cigertînû m û dexwazim nimê lew behrî îhsane

Be yek-du qetre nêr awî heyatî ke weku qîgmîr
Le kehfî xotya rê de, segî eshabî xotan e

Dekem erzî niyaz, herçî le to nayab e mexfiyî raz
Be can û dill, dill û canim xudaxwahane xwahan e

L eto hubbî Xuda bo xom û bo ewlad û ehbabim
Ke hubbî ma sîwa derka le dill wek bit le bitxane


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xudaya hem le to hubbî resûl û îttîba‘î ew
Ke îksîrî misî mahiyetî mexşûşî însan e

Bibarê ya rebî her lehze sed lek barişî rehmet
Le ser ew, hem le ser ew cem‘î al û sehib û yarane

Heta agir girrênî şorrişî teb‘ û xiroşî dill
Kize û sozeyî nesîmî subh û êwareyî beharan e

Seba, ta lêwî xunçeyî gull deka te‘lîmî şekkerxend
Nesîmî subihdem ta perçemî sunbul deka şane

Heta hewrî beharî xazekarî gullşen e îşî
Heta bulbul le ser gull nexmexwan û nallesebhan e

Billên îns û melek pirr bem zemîn û asmanane:
We sella l-lahu ‘ela ew behrî nûrî ‘îlm û ‘îrfane
Ke derkî xewrî naga xeyru ‘îlmî l-lahî subhane

## Stayişî hezretî Mewlana Xalidî Neqişbendî

Dillim emşew nexoşî nîsbetî çawêkî bîmar e
Ciger xelltanî xwênî hesretî lêwêkî xûnxwar e

Serim şêwawî şêweyî fîtnehellgîrsênî şoxêk e
Hewasim tefreqeyî ‘işweyî dillaşûbêkî ‘eyyar e

Xeyallî zullfî dernaçê le dill ta derneçê rohim
Spêrawe xezêneyî bextî ême bew siyamare

Le şînî fîrqetî ew da ewende eşkî sûrim rît
Be dewrî cêgema ta birr dekatin dîde, gullzar e

Le bo seyranî bax û sebze teklîfim meken yaran
Ke sebze û gull le çawim da be bê ew her xes û xar e

Nemamî qametî perwerdeyî awî dîdekeyî min bû
Keçî gullçînî baxî wesllî ew êstake exyar e

Be derdî xomewe ger goşeyek degirim be bêdengî
Be lama dê bexşim û riq dellê: Xo neqşî dîwar e

Ke dêm îzharî şorr û şînî dill kem, bellkî rehmê ka
Be xende dê dellê: Xollî be ser da bêjin em hare

Witim ba bes wicûdî bêwicûm barî xatir bê
Le gell dill goşeyêkim girt, ewim berda be yek bare

Le kuncî bêkesî da muddeyêkim birde ser, axir
Şewê dill kewte behsî bêwefayî ew sitemkare


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Witim: Ey dill le dulber şekwekirdin heyf e. Dill deywit:
Eme bo dulberêkî dillnewaz e, ew dillazar e

Witim: Xoş e be umêdî wefa cewr û cefa. Deywit:
Be ser çû ‘umr im û nemdî wefayek lew cefakare

Witim: Penha niye derheq be ‘aşiq lutfî me‘şûqan
Witî: Ew zahîr û bagîn le zumreyî ême bêzar e

Weger na, def‘eyek lem beyne bo def‘î gile deywit
Hewallêkî bipirsin, çon e ew mezllûyî bêçare?

Le pirr bayek le gell boyî aşna hat û witî: Mehwî!
Beşaret bê ke îqballit mubarek, tali‘it yar e

Ke hatim, şoxekeyî xaretgerî dîn û dillit deywit:
Bipirse hallî ew sewdazedeyî bedbextî aware

Debê bê aftabî rûmet û subhî cebînî min
Çi ferqêkî bibê rojî le şew, subhî le êware!

Witim: Wa seferazit kirdim, emca sa dexîlit bim
Le batî min, seba, to deçiyewe erzî ke emcare

Egerçî mudeyêk e min le zullmanî siyabextî
Wine derreyî wicû m, rojî ronak im şewî tare

Le feyzî nawî Mewlana Ziya’uddînewe êste
Hemû roje şew im, qetreyî wicûdim behrî enwar e

Heta ew nawe pakem kirde zîkr û fîkrî roj û şew
Henasem bonî mîskî girtuwe, lêwim şekerbar e

Be yumnî ew, behar e payiz û zistan û hawînim
Ke her gahê bikem behsî le dewrim gull be xerwar e

Be îxlasî ewim awênekeyî dill wa cela dawe
Ke çîhreyî şahîdî meqsûdimî tê da nimûdar e

Cemalî rabîteyî wa dill bere, bextî xewallûşim
Be umêdî temaşayek hemîşe çawî bêdar e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM